

Sal: 1 Hejmar 17 14-20 Hezîran 1992 3000 TL (KDVD Rojnameya Hesteyî)

Sebra Telabanî bê Enqerê nayê



Serokên Başûrê Kurdistanê elimîne derve, bê derve sebra wan nayê. Geh li Bexda, geh li Tehranê, geh jî li Şam û Enqere ne. Tim jî bi devê wan "bêçare ne, bê mecal in û mecbûrê têkiliyên bi hikûmetên dagîrker re ne."

Rûpel 15

Dewletê berê xwe daye rewşenbîrênd Kurdish. Terora devletê nasekine. Li dijî vê terorê:

Yekîti xwirt dibe

Divê herkes zanibe : Heyfa dilopeke xwînê jî li erdê namîne

● Rojnamevanê Ozgur Gundem Hafiz Akdemir 8'ê Hezîranê ji teref hê-zên dewletê ve hate kuştin, dora rojê cenazê Hafiz ji aliyê polîsan ve hate revandin û defin kirin. Cih û war li dewleta Tirk teng bûye, şas bûye û har bûye. Bi tu awayî rastiyê qebûl nake. Li hember gerilla xwe nagire, hêzên wê belav dîbin, ji aliyê din ve têkoşîna gerilla bilind dibe û têkiliyên gerilla bi gel re roj bi roj xwirtir dib in. Ji ber vê yekê dewlet ji tîrsa xwe har bûye, da ku rî li pêşîya têkoşînê bigire, çavê gel bitîrsîne bi metodêngemarî û bi hovîfî êrisî ser gelê Kurd dike; rewşenbîr û rojnamevanênd Kurdish ji paş ve dikuje, dixwaze bi tirsandinê, gel ji têkoşînê dûr bixe.

Rûpel 15

Li Laçînê hikûmeta Kurdan hat îlankirin

(ALMANYA - WELAT)

Li gora nûçeyên ku ji Laçînê dighîjin me, çend roj berê li Laçînê hikûmeta Kurdan ji bo damezrandina otonomiyê hatiye îlankirin. 16 rewşenbîrênd Kurdish, di nav hikûmetê de cihê xwe girtîne û dest bi karê xwe yê rîexistinî, siyasi û leşkerî ki-

rine. Têkoşerekî Kurd Wekil Mistefayev ji bo serokatiya hikûmetê hatiye pejîrandin.

Wek tê zanîn, di meha Gulanê de Laçîn ketibû destê Ermeniyê leşkerî. Di vî warî de keda Kurdan ji hebû, wan piştgirî dabû Ermeniyan ji bo piştgiriya Er-

meniyên Qerebaxê yên ku 4 sal in di nav esaretê de ne.

Hikûmeta Kurdan di destpêka karê xwe de girîngiyê dide parastina axa Laçînê.

Gelo wê ji Kurdan re ciqas li hev bê, ji bo bîghîjin armâanca xwe, wê di dema pêş de diyar bibe.

Kurdêñ Yekîtiya Sovyeta berê dixwazin cîhan dengê wan bibihîze

Di roja 3'ê Hezîranâ ûsal de rîexistina "Yekbûn" ya Kurden Yekîtiya Sovyeta berê li ser navê sekreterê giştî yê Yekîtiya mîletan Bûrûs Galî û serokên hemû dewletên ku éndamên vê rîexistina neteweyan in, bangek belav kir. Di vê bangê de siyaseta dewleta Tirkîye ya terorîst li hember gelê Kurden tê rûreskirin û guneh-karkirin, li ser qetîfama di Newroza ûsal de ku hêzên rîjima faşist anîn serê mîrovîn sîvîl, tê naletkirin. Her wiha rîexistina "Yekbûn" li ser navê Kurden neh (9) komarîn Sovyet, hêvî ji Yekîtiya neteweyan kiriye ku dawê li seroketiya Tirkîye bike ji bo leşkerîn xwe yê dagîrker ji axa Kurdistanê derxe,

terora li hember gelê sîvîl bisekinîne û hemû girtiyên sîyasi yên di hebsen Tirkîye de berde. Kurden wisa ji pêşneyar kirine ku Yekîtiya neteweyan li ser pirsa di Kurdistanê de derbaskirina referandûmê raweste ji bo gelê Kurden bi xwe biryar bike ku pêşeroja wî wê çawa be.

Bilî vê bangê bi şaxê ber-

pîrsiyarîn rîexistina "Yekbûn" û bangeke din ji hema di wê rojê de hatiye weşandin. Ew bang vê carê ji serokatiya Tirkîye re hatiye rîkirin. Di wê de jî sîyaseta dewleta Tirkîye ya dagîrker û faşist li hember Kurden û Kurdistanê di hêna Ataturk de heta niha hatiye bediomekirin û rûreskirin. Di bangê de wiha tê gotin:


Rûpel 15

ROJEVA WELÊT

Wezîfa Hafiz û ya dewletê

Hafiz, rojnamevan û welatparêzê Kurdish û dostê gelê bindest bû. Ji aliyê dewletê ve hate kuştin. Dijmin dewlet e, dewlet dijminê gel e. Dijitiya gel faşizm e. Hafiz û Dewleta Tirk li dijî hev bûn. Yekyar, yê din neyarê gel e. Hafiz li pey rastiyê û fedekar e, dewleta Tirk ji li pey veşartina rastiyê û zordar e.

Rûpel 15



Hafiz ji berê ve û heta roja dawî ji, gelê xwe bi tenê nehişt. Divê gelê
Kurd ji li Hafizîn xwe xwedî derkeve.

Rewşen Saleh Bedirxan cû ser heqiya xwe

Di roja 1'ê Hezîranâ ûsal de pîreka Mîr Celadet Alî Bedirxan, Rewşen Saleh Bedirxan cû ser heqiya xwe

Wek ku tê zanîn, Rewşen Bedirxan rewşenbîreke bi nav û deng bû. Wê di jiyana xwe de pirr tiştîn bi rûmet kir, ji bo parastin û pêşvebirina çand, wêje û zimanê kurdi. Rewşen Bedirxan gellek pîrîk, belge, wêne û weşan

kom kirine, yênu ku li ser kar û xebatêñ malbata Bedirxanîyan in. Ewê wisa ji kare wergêriyê dikir, pîrîkîn wê bi zimanê cihê-cihê derketîne.

Rehmetiya Rewşen Bedirxan li bajarê Şamê di goristaña Şêx Xalid ya taxa Kurden de, li kîleka gora Mîr Celadet Alî Bedirxan hate binaxkirin.

Di vê hêjmarê de

- Xwendekarêñ zanîngehêñ Almanya : 'PKK evîna gelê Kurd e'
- Ragip Zarakolu
Li El Salvadorê hikûmet aştiyê sabote dike

Rûpel 3

- Mesaja Serokê ERNK Abdullah Ocalan: 'Şoreşa Cotmehê di PKK de jiyan dibe'

Rûpel 4

- Rojnamevanê Riya Teza Prîskê Mihoyî: 'Ji bo serxwebûn û azadiyê, pêşmerge bi çeka xwe û rojnamevan bik pînûsa xwe!'

Rûpel 10

- Mistefa Reşîd ji Berlinê dinivîse: Ala rengin li bajarê Berlinê
Li ser kela "Spandau" pîl dib e

Rûpel 16

REWS

Abdullah Keskin



Metod û îtham

Wê bê bîra we. Di pênc hejmarên Welat de niviseke Koyo Berz hatibû weshandin. Bi navê Folkloira Kurdî-Diroka Destana Memê Alan û Nureddîn Zaza bû ev nivîs.

Piştî sê hejmaran ji nivîskar û xwendavanên me gellek rexne hatin ji me re. Me yek ji wan rexneyan gellekî kurt kir û piştî nivîsa Koyo Berz xilas bû, di hejmara sêzdehan de çap kir: J.Suwar-Dîziya Ilm ji ya Pezan Pirr Pirr Xirabtîr e. Suwar, di nivîsa xwe de bi firehî li ser nivîsa Koyo Berz disekinî û bi kitêba Nureddîn Zaza re muqayese dikir.

Heçî nivîs dixwend, heq dida J. Suwar. Nivîs ji serî heta dawiyê ji kitêba Nureddîn Zaza hatibû girtin.

Berî bi 2-3 rojan Koyo Berz, heşt rûpel destnîvis bersiva rexneyen J. Suwar şand. Ji bo ku hê jî bi nivîskarê me re xeletiyê metodi hene, em li ser vê pirsgirêkî disekinî. Di ïthamên Giran de wiha dibêje Koyo

Berz:

"EZ ji rexna hez dîkim û pê kêfxwes di bim. Bes rexne di cih de û riya rast nişanî min bike. Heval di rexneyen xwe de bl heq e. Lî riya rast nişanî min nade û ser de jî min dîşine..."

"Gelek kes hene folkloira me, dinivîsin û navê xwe li ser datînin. Kes tişteki nabêje. Ji bo çî?

"Gellek kitêb hene heval nuh ve wan çap dîkin û navê nivîskarê wan jî li ser nanîvisin, hûn jî vê re ci dîbêjin?"

Rola rexnegiriyê her demê û di destpêkê de pirr girîng e. Ji bo pêşerojeke başfir û literatura me bi pêş keve rexne pêwist in. Em ji rexna natîrsin û naeşin. Em hêvî dîkin ku tu kes jî netirse û neêse. Her rexne mirov ji xeletiyân dur dixe û bi pêş de dibe.

Bi van gotinê Koyo Berz em kêfxwes bûn. Rast e, gellek nivîskar hene ku li ser berhemên nivîskarê din dicêrin. Heta ji me were emê wan mirovan teşîr bikin. Lî ev metod xelete û ïthamên J. Suwar heq dike:

"Min ev nivîs wek uzetek Memê Alan girtiye."

Koyo Berz qebûl dike ku ev nivîs ji kitêba

Nureddîn Zaza girtiye. sebeba wî jî ev e: (Ez bi kurî dinivîsim) Weke kitêba Memê Alan bi sedan kitêb hene ku xelk wan nasnake, nakevin destê gel. Divê mirov wan bide naskirin, "uzetekê" ji wan derxe û binivîsine. "Eger wextê min hebe, ezê gellek tişteken usa derxim û bisinim rojnamen re. Mirov nikarekitêbê hemû di rojnamen de çapke, lê dikare uzetek bîçuk biweşine."

Erê, baş e. Lî tu cara ev naye wê manêku tu navê nivîskar derxe û li şuna wî navê xwe binivîsine. Ev metodeke gellekî çewt e. Tu elâqa wê jî bi ilm re tune ye. Bi van metoden kultura me bi pêş nakeve. Bi sedan varyantên destanê Memê Alan hene, yên ku hê nehatine nivîsandin. Yen ku bixwazin li ser vî destanî bixebitin bi kêmâsi karin varyanteke wî berhev bikin.

Çend nivîskarê Kurd heta niha li ser Memê Alan nivîsandina hemû ji referansa wan Nureddîn Zaza ye. Li welatê me heta niha riya xebatên ilmî girtî bû. Sebeb ne ev tenê ye. Divê em berê şujinê bidin xwe. Xebat û lêkoşînîn li ser çanda me qels in.

Rola rexnegiriyê her demê û di destpêkê de pirr girîng e. Ji bo pêşerojeke başfir û literatura me bi pêş keve rexne pêwist in.

Em ji rexna natîrsin û naeşin. Em hêvî dîkin ku tu kes jî netirse û neêse. Her rexne mirov ji xeletiyân dur dixe û bi pêş de dibe.

FERHENGOK

Agahdar: Xeberdar (haberdar)

Berhem: Ürün, eser

Berjewendî: Menfaat

Bêje: Kelime

Bingeh: Temel

Biyanî: Xerîf (yabancı)

Cejn: Eyd, bayram

Cuda: Cihê (ayrı)

Enî: Cephe

Girîng: Önemli

Hembêz: Göğüs, kucak-

Hemwelati: Vatandaş

Hevbes: Şirîk (ortak)

Hîndekarî: Öğretim

Keşti: Gemi

Kovar: Dergi

Mêtîngeh: Sömürge

Mînak: Ömek

Parastin: Muhofaza

Perwerde: Eğitim

Peyman: Antlaşma

Pêwist: Lazım

Pivan: Ölçü

Rewşenbir: Aydin

Sedem: Sebeb

Sey: Ders

Şagirt: Talebe

Taybetî: Özel

Tîp: Herf (harf)

Werger: Tercüme

Wergêr: Tercüman

NAMEYÊN XWENDEVANAN

NAMEYÊN XWENDEVANAN

NAMEYÊN XWENDEVANAN

Rojnameyeke kurdî di welatên mêtîngeh de...

Germitirîn rîz û silavên mişextiyî û dilsotiya welat, ji bo karbides û berpirsiyaren Rojnameya Welat dişînim.

Di domahîka sedan salên reş û târi de rojnamegeriya Kurdiyî, li ser rîbaz û ramyariyeke nuh li hola xebatê ye. Hêvîdar im di vê kar û xebata giranbuha de, bi destdirêjiya rewşenbiren Kurd, wê her serkevî û serfraz be. Welat wê di severesiyyê mêtîngeran de bi tîrêjîn xwe ronahî li çand, huner û wejeya Kurdî bike.

Serboriya dîrokî, sîd girtin ji pêkhatinê Başûr û Rojava de, her gav di bin ala ramyari û rehberiya hemdemî de Welat wê bikaribe cihekî dîlînî di nav civaka me de bigre. Ji ber ku em rasteqinîyên van rojan ji bîr nekin û bizanîbin rojnameya me û yêne wek me li tenîst berhemên ci ne? Wê gavê em di xebatkarya weşanîn xwe de tu car cewfî nakin. Ev bîranîn divê herdem li beramberî me neynik be.

Di derheqê we de pirr hindik xwediyê zanyariyê me, ji bo vê jî dixwazim li gel we destkariyê bikim. Ger em hevûdu ji nêzîk de nas bikin, wê gavê destkariya me li gel hevûdu hinta zêde dibe.

Bê guman hûn jî dizanîn ku salixên rojnameyeke bi kurdi, di welatên mêtîngeh de dîkarin gelek kîyarîn girîng pêk bînin. Ji bo vê jî bes û destkariyê me pewist e li her aliî welat hebin. Ez di vî warî de hemû şîyar û zanyariya xwe ji bo we pêşkêş dîkim û li gel we di hemû layan de ji bo xebatân amadekariya xwe diyar dîkim.

Di kar û xebata rojnamegeriya we de serkevîn û serbilindî her û her daxwaziya min e

Li gel ciwantîrîn rîz û silavên bîrayefî

Birayê we
C. Rewşen Laleş
Urmiye

Tîp îşareta deng e

Di kurdi de dengê "i" heye. Ji ber vê yekê jî, di alfabebla kurdi de tîpa (herfa) "i" hatiye danîn. Anglo tîp îşareta deng e. Di gelek zimanê Hind-Ewrûpî de, ji ber ku dengê "i" tune, tîpa "i" jî tune ye. Di hinek grûbên bingehîn ên zimanê din de jî ev deng tune ye. Wek nimûne di zimanê erebî de jî dengê "i" tune û tîpa "i" jî di alfabebla erebî de tune ye. Wek em hemû pê dizanîn Kurdîn Başûr û yên Rojhîlat bi alfabebla erebî kurdi dinivîsin. Di alfabebla erebî de jî tîpa "i" tune ye. Wan bi xwe jî vê tîpa han cînekirine. Herwiha Kurdîn Başûr û yên Rojhîlat ew dengen ku bi "i" derdi Kevin, nanivîsin. Anglo di alfabebla kurdi ya erebî de tîpa "i" tune ye. Wek nimûne, di şûna "min", "mil", "kir", "kin" û "dibistan", "digirin", "zivistanê" de, "mn", "ml", "kr", "kn" û "dbstan", "dgrn", "zvstan" dinivîsin.

Ez di vê nivîsa xwe de, gotûbêja (munaqeşa) baş û xirabûna alfabebla kurdi ya erebî namik. Lî, tişteki heye, ku ev alfabebla kurdi re nabe. Carek dengê kurdi wînida dike, bersiva dengê kurdi nade. Ji aliye fonetiç ve jî çend tîpên bê deng nikarin deng derbi-xin. Mesela "mn" dengê "min" dermaxe. Bi alîkariya tîpên bi deng, deng ji kîte û bêjeyan (hece û kelîman) derdi keve.

Nîha her çiqas kêm be jî, mirov dibîne, ku hinek kes, di çend nivîsar û berhemên xwe de, wek alfabebla erebî tîpa "i" her çiqas ji alfabebla Latînî ya kurdi derne-xistibin jî, lî, bi kar jî nayîn. Bi taybetî Feqî Huseyn bê prensib û qanûn, dilê wî li ku bixwaze li wir tîpa "i" bi kar tîne an jî nayîne. Ev kesen wiha dibêjin qey "me alfabe û gramerâ kurdi ya nuh dî" an jî "afirand." Ji aliye din ve diyar dibe, ku agahdariya wan baş ji nivîskar û ronakbîrîn.

Başûr û Rojhîlat jî tune ye, ku ew çiqas li ser tîpa "i" gotûbêjikin. Nê bi tenê kêmâsi û çewtiyîn tîpa "i" herwiha kêmâsi û çewtiyîn alfabebla erebî bi teví tînîn zîmîn.

Bedirxanî di hinek nivîsarên xwe yên gramerî de, bi taybetî Kamuran Bedirxan li ser taybetîya tîpa "i" rawestaye û xwestiye jî re prensibîn nivîsandinê bibîne (1). Lî, wan li gor kîf û zanîna xwe tîpa "i" ji navê ranekirine. Ew li gor prensibîn hevbesiyen grametik ên zimanê Ewrûpê çûne. Li gor van prensibîn giştî, ew bêjeyen ku bi "bl", "br", "dr", "fr", "jm", "ql", "qr", "sp", "sl", "st", "şk", "şt", "tr", "pr" û "zm" dest pê dîkin di nav wan de tîpa "i" ya yeke-mîn bi kar nayîne û nanivîsine. Ji bo vê yekê jî, mînakîn wiha dane; blêc, blûr, brandox, braştin, brûsk, dran, dram, frotin, frûmaye, jmartin, qlewî, qren, spas, spehi, spî, şkér, ştiyar, prot, traş, traştin, zman, zmanok...

Wan di bin danezanê xwe de jî, dîsa dane diyarkirin, ku mirov dîkarde di navbera wan de tîpa "i" jî binivîsine. Anglo du alternatif danîne.

Paşê di nav proses û pratikê de, Kamuran jî, di vî warî de dîtinên xwe guhertine. Mirov vê yekê di nivîs û berhemên wî de dibîne. Ev mijar gelek zelal û diyar e. Mijareke bê şîrove ye. Bedirxanî bi hezaran nivîs nivîsande. Piştire nêzî 60 salî ne, ku Kurd alfabebla Latînî bi kar tînîn. Bi taybetî di van 10 salên dawî de, li Ewrûpa, li ser ziman û edebiyata kurdi xebatân hêja hatine kirin. Bi sedan pirtûk, kovar û rojname bi kurdi derketine. Bê hejmar li ser ziman û alfabebla kurdi semîner û civîn hatine çekirin. Di nav gelek kesan de gotûbêj û rexne hatine kirin. Kurdîn Soran û yên Kurmanci di

eynî kovar û rojnameyan de, bi hevdu re xebitîne. Semîner li zavavayan çekirine. Beşdaren kursen soranî û kurmancî bûne. Bi kêmâsiyîn xwe ve 10 sal in, ku di dibistanê Swêdê de dersen kurdi têr dayîn. Wergêr û tercûmanen kurdi hene. Kongreyen komele, Yekîtî, federasyon û enstituyen Kurdan bi kurdi dibin. Sev, civîn, meş û mitîng bi kurdi têr amadekirin. Piştî ewqas sal û xebatên dijwar û hêja zîmanî kurdi yê nivîsê pêşve çûye.

Bi kêmâsi û çewtiyîn xwe ve kurmancî edî bûye zimanî nivîsê yê edebî û siyasi. Di hinek pirs û pirsgirêkîn ku di dema Bedirxanan de, imkanen gotûbêjan tûnebûn, li ser wan iro hatiye nivîsandin û gotûbêjkirin. Lî, dîsan jî, ev naye wê wateyê ku pirs û pirsgirêkîn zimanî kurdi ji binî ve çareser bûne û tê kêmâsiyîn wê nemane. Lî, hinek kes hene, ku haya wan ji vê proses û pêşveçinê tune ne û radibin wek 20-30 sal berê, li ser gramer û zimanî kurdi hema ci tê bîra wan dinivîsin. Wek ku Amerîka ji nuh ve bibînîn, rîzmanan û gramerîn kurdi dinivîsin. Teoriyên ziman çedîkin. Ders didin. Bi xwendîna çend pirtûkîn kevin an jî, ji çend cihan bihistina çend gotînîn soranî û kurmancî mirov nabe zimaniane. Derde serê derdan, heger mirov bi ser de van gotîn an jî bêjeyan çewt û şas hîn bibe an çewt û şas bi kar bîne! Ev berpirsiyariyeke gelek mezin dixwaze. Mirov nikare ji bin rabe.

Di vî warî de, ew bêjeyen ku di destpêkê de, bê "i" tê nivîsandin bi "sp" û "st" destpêdikin in. Wek, spas, spartin, stran, strû, strî û hwd... Dîsa, ew bêjeyen ku ne kurdi ne û me ew ji zimanî Ewrûpî girtine divê ew wek orjinala xwe bîn nivîsandin. Wek, gramerîk, pratik, kron, kronik, spor global, grûb û hwd. Prosesa zimanî kurdi ya nivîsê ku iro têde ye ev e.

KARTA ABONETİYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ... pê ve min bikin aboneyê Rojnameya WELAT

Nav :

Paşnav :

Navnîşan :

Bedelê abonetiyê razînin:

Li Tîriyê : Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu

Şub. Hesap No: 379809

Li Derve : Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu

Şub. Döviz tevdîat hesap No: 3113617

Aboneyen hêja,

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevlî kopyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînîn. Navnîşana

WELAT Nuruosmaniye Cad. Atay Apt.

No:5 Kat:1 D.4

Cağaloğlu / İSTANBUL

Tel: 511 57 60-511 66 02 Fax: 511 51 57

Li El Salvadorê hikûmet aşıtyê sabote dike

✓ Li gor peymana lihevhatinê, lazim bû ku 1'ê meha Gulanê gerilla qismek ji sîlahêne xwe teslîm bikirana. Lê belê bi derxistina vê qanûna nuh re diyar bû ku hikûmet dixwaze leystikênuh çêbike û bi stratejiya provakasyonan planê aşıtyê ji holê rake. Ji ber vê yekê gerillayan jî programê teslîmkirina sîlahan dane paş.

✓ **Li El Salvador pêvajoya "Aşıtya bi sîlah", Yanî cureyek şerê sinîrê dom dike. Gerilla di nava civakê de bûne xwediyê cihekî legal. Lê belê li pêsiya gerillayen FMLN hê jî riyekê dirêj û dijwar heye.**

✓ Li ser domkirina cînayetên Mangayênu Kuştinê, serokê kolordiya gerilla yan Carlos van gotinan dibêje: "Şer qediya, lê niha şerê qirêjî (erjeng) dest pê kir"

ya, lê niha şerê qirêjî (erjeng) dest pê kir". Li gor peymana ku di navbera her du aliyan de hatiye çêkirin lazim e Polîcîa de Haçienda (Polîsê Malî) û Muhabîfîen Neteweyî heta 2'ê Adarê bêñ belav kirin û ji ber ku pêwendiyêwan ên bi Mangayênu Kuştinê re derketine meydanê. Parla-

mentoya El Salvador ku partiyêne tê de zehfîn wan ji aliyê rast in, di dawiya meha Nîsanê de bi derxistina qanûnekî nuh maddeyekî girringirînen peymana lihevhatinê îhlal kir.

Ev qanûn jî li ser van hêzên ku hatibûn belavkirin bû. Li gor vê qanûna nuh ev herdu hêz (polîsê malî û muhabîfîen Neteweyî) lazim e bi pêkanîna emniyet û huzûrê re eleqeder nebin, lê hebûna xwe jî divê berde-wam bikin.

Di meha Adarê de jî, dema hikûmet xwest van herdu hêzan ji bo "emniyeta sînor" wek "polîsê leşkerî" bikar-bîne ji teref tevgera rizgariyâ

FMLN ve hatibû protesto kîrin.

Li gor peymana lihevhatinê, lazim bû ku 1'ê meha Gulanê gerilla qismek ji sîlahêne xwe teslîm bikirana. Lê belê bi derxistina vê qanûna nuh re diyar bû ku hikûmet dixwaze leystikênuh çêbike û bi stratejiya provakasyonan planê aşıtyê ji holê rake. Ji ber vê yekê gerillayan jî programê teslîmkirina sîlahan dane paş.

Li El Salvador pêvajoya "Aşıtya bi sîlah", Yanî cureyek şerê sinîrê dom dike. Gerilla di nava civakê de bûne xwediyê cihekî legal. Lê belê li pêsiya gerillayen FMLN hê jî riyekê dirêj û dijwar heye.

Ragip Zarakolu

Weke ku tê zanîn hikûmeta El Salvador, demeke dirêj nexwestibû bi gerillayan re ji bo aşıtyê li ser masê rûne. Lê belê di dawiyê de hikûmeta El Salvador li ber daxwaza gelê El Salvador û pesta (Opresyon, baskî) raya giştî entemasyonal xwe negirtibû û mecbûr mabû bi gerillayen FMLN (Eniya Rizgariya Neteweyî ya Farabundo Martî) re, ku heta hingê ew wek terorist flan dikirin li ser masê rûniştibû û dest bi mu-zakereyê aşıtyê kiribû. Ev hevdîtin û muzakere di bin çavdêriya Yekîtiya Miletan de du sal dewam kirin. Nihayet di 16 ê meha Çile 1991 ê de peymana lihevhatinê dest-xet (îmze) kirin.

Ev peymana ku li gor "Aşıtya bi sîlah" (silahli barış) politikaya nuh a gerilla, artêşa El Salvador û hikûmeta li ser kar, li ber çavê raya giştî aştînexwaz û neheq dane eşkere kirin, ji ber vê yekê artêş û hikûmeta El Salvador ji gel tecrîf bûne.

Peymana lihevhatinê hatmor kirin, lê politikaya hikûmetê ya zordar domkir. Artêşa El Salvador, Mangayênu Kuştinê û kesenê di nav olıgarşîya vê dewletê de bûn ji vê lihevhatinê ne memnûn bûn.

Roja ku peymana sekinanda şer dest pê kir, 1'ê Sibatê, dema gelê. El Salvador alayen FMLN di dest de derketin meydanan û ber bi gerillayan ve bazdan û ew himbêz kirin, mangayênu kuş-

tinê (qontr-gerilla) jî eyîn şevê xêniyên rîexistinê gel û malen welatparêzan bombe kirin.

Hikûmet ji aliyekev ve ev bûyer protesto dikirin ji aliye din ve destek û alîkarî bidizî dida Mangayênu Kuştinê da ku welatparêzan bikujin.

Ev rewş û bêbextiya hikûmetê dibe sebeb ku gerilla tedbîrên xwe zêdetir biki. Niha qolêñ artêşa El Salvador xwe kişandine leşker-gehêñ xwe. Li aliye din, qolêñ gerilla jî li hinek navvendê sereke kom bûne.

Li ser domkirina cînayetên Mangayênu Kuştinê, serokê kolordiya gerilla yan Carlos van gotinan dibêje: "Şer qediya,

Yekîtiya xwendevanan li Romanya jî damezirî

(ROMANYA-WELAT)

Di bin slogan "Hemû xwendevanen Kurdistanê yên welat-parêz di nava YXWK de bibin yek!", xwendevanen Kurd ên ku li Romanya dixwînin, xwe gîhandin qonaxa damezirandina Yekîtiya Xwendevanen Welatparêzen Kurdistan (YXWK)-Şaxê Romanya.

Bi besdarbûna gelek partiyen Romanî yên weke: Eniya Rizgariya Neteweyî (Partiya li ser hikum), Partiya Neteweyî ya Azad, Partiya Cumhûriyetî, Partiya Demokrafi ya Azad, Yekîtiya Xwendevanen Welat-

parêzen Qibrise, Yekîtiya Xwendevanen Romanyayê... û gelek hunermend û hozanvanen Romanya yên bi nav û deng, kongreyê dest bi rojeva xwe kir.

Piştî xwendina rapora Komîteya Amadekar, ku rewşa xwendevanen û girêdana bi şoreşa neteweya Kurdistan ve şirovedikir, gotübêjeke fireh li ser hate kirin. Di gel hinek guhertinê serveyî bi giştî hate pejirandin.

7 kes ji bo Komîteya Giştî bi şeweyekî demokratikî hatine hilbijartın. Wisa jî, soza xwe li pêsiya besdaran dan ku wê heya dawiyê girêdayê destûra YXWK û serxwebûn û azadiya

Kurdistanê bin, wê bibin hîmek ji bo tevgera rizgariya netewe-yâ Kurd.

Li dawiyê, Kongreyê gelek mesaj şandin. Di serî de mesajek ji bo serokê **PKK Abdullah Öcalan, Gerillayen ARGK û Şehîdîn şoreşê**.

Weke ku tê zanîn, Şaxê Yekîtiya Xwendevanen Welatparêzen Kurdistan li gelek weletânen din jî hene, wek: Şaxê Yûgoslavya, Şaxê Bulgaria, Şaxê Rûsiya, Şaxê Almanya û Şaxê Polonya. Navenda Yekîtiyê jî li Almanya bajarê Bonnê ye.

GOTİN

Yaşar Kaya



Kela Diyarbekirê

T u kilam û tu stranen me tune ne, ku kela Diyarbekirê, zîndana Diyarbekirê, nexweşxana Diyarbekirê tê de derbas nebe. Çiqas kilamên kuştinê, mîraniyê û kîlamên şer hebin Diyarbekir tê de derbas dibe. Ji çiyayê Sipanê Xelatê, ji Agiriyê, ji deşta Rewanê bigirin heya gola Wanê, ji wê bigirin heya Bîngola şewiti hezdkin guhê xwe bidin kilama Bîşarê Çeto, yan ji Eminê Perîxanê. Torinê Mala Kosa, Nadirbegê Şêxbiziniya, ji xiñusê heya Pîranê di nav mîraniyê û mîrxiya şeran de, mîna qibleyek, mîna Mekke û Medîne, mîna ziyaret û mîzgeftike mezin kela Diyarbekirê heye.

Guhê xwe didime dengbêjekî ji aliye Mûşê: "Dibê neçe Romê Rom xayîn e."

Dizivirim tême Tendûrekê, Evdalê Zeynîkê bi çavê xwe yê kor dibêje, lawo "Dideme xweş dideme, çavê apê te kor e rê nabîne." Li Taxilkâ, li Qerebilaxê, Bazida xopan û eskerê İhsan Nûrî, berê wan dane kela Diyarbekirê.

"Kela Diyarbekira xopan bi xof û derz e".

"Li sûka Diyarbekirê cenazê bavê Şûto dane ber gulleyen-mawzerê, dest nadine bedena bavê min"

"Vê berbanga sibê destê bavê Güzîzarê xistine kelepçê, pê re bi tirkî xeberdidin, dibêjin 'Kurdo yuru. Li bajarê Diyarbekirê dinere Mîrê Zirav mîna esîrekî.

"Dibê bavê Koroxlî nexweş e, rakirine nexweşxana Diyarbekirê, dibê derman danê, hewara me Sîdê Nado, bavê Dilşâ e".

"Herçî kesê gulla wî jî pê re lêkeve, şik û subhe tuneye ew şehîd e delalê yadê." Berê bavê Dilşayê vê sibehê dane kela Diyarbekirê, de bûkê rabe xêni maye bê xwedî...

Kofiyê şeng, şal û şemaqiyê Diyarbe-

kirê li ber kefiya heft reng e dîlber canê, ne tu roj e, ne tebat e ey dîlber, dil bi kulê dîlber canê, derê ma la bavê me rewş e, gûlî reş e.

Di şin û şahiyê me de, di mîrxasî û şerîn me de, ji şal û şapîkên modanî bigirin heya xeliya bûkan, ji mar û mîrcanîn Zendê qîz û bûkan heya şehr û şema yê ber kefiyê seriyan, jê bêhna xweliya weletâne me tê.

Di tu derê dinê de, mûsika tu weletî, tu mîletî, mîna mûsika Kurdan welatparêz û neteweyî nîne, şoreşger nîne. Ew bi her awayî deng û dilê gelê me ye, mîna silava weletâne me ye, zelal e, bi xem e, bi kul û derd e. Lê belê bêhna gul û sosinêne weletâne me jê tê. Serhildana sedan salan e, mîna kalê kalan, kar û berxan e, mîna nale nala birindaran e, dil û kezeba mîrov dihelîne.

Bi kurtasî em dikarin bêjin, xwîna me ye, keda me ye, dilê me ye, bêhna me ye, carna mîna çemê Muradê ye, carna berfa quntara çiyayê me ye, carna ronahiya ber çavê me ye, ew dengê birîna me ye.

Elemanen Tîmê Taybetî (Özel Tim) :

'Em giş nexwes in'



Timê Taybeff dixwazin kîlîkî berî birevin ji Kurdistanê

Elemanen Tîmê Taybetî û şûbeya li hember terorê, alî-kariyê dixwazin. Agir li Wezîrê hundir İsmet Sezgîn dibarînin, dibêjin: "Ew ne xwediyê soza xwe ye." Ji rojnameya Milliyetê şûba Enqerê re ev dibêjin: "Mîrin li pey me ye. Em û zarokêne xwe dûrî hev in. Gellek ji hevalên me li malên xwe xew nakin. Xanî ji bi destê me nakevin. Yê mal peyde

kirine ji newêrin li malên xwe razên. Bi roketan, bi çek û bomban digirin ser me. Hizûra me tune. Em nikarin bê tirs wezîfa xwe bibin."

Pistre gotinê tînin ser İsmet Sezgîn û dom dikin: "İsmet Sezgîn dema Newrozê hat Şîrmexê. Soz da ku me zêdeyî 2 salan li vir nehêle. Ev du meh û nîvîn me derbas dîbin. Hikûmet xwe kerr

dike û soza da me nayne cih. Em tayîna xwe dixwazin, em naxwazin zêde li vir bimînin. Her wiha kengî û ji ku wê li ser me deynin em nizanîn. Mirin tim li dû me digere. Sînîren me tev xerabûne. Xew nakeve çavêne me. Me tedawîya psîkolojîk divê. Ji bo ku em karîbin li heyatê bimînin em hînê kuştinê kiri. Berî em herin nav civatê divê em tedawî bibin."

Doktor di bin zoreke mezin de ne

Komela Tebîbîn Tîr (TTB) heyetek şand Kurdistanê. Ev heyet di rojê 9-17'ê Nîsanê de li çend bajaran geriya. Bajaren heyet çûne wan ev in: Mêrdîn, Amed, Şîrmex, Cizîr û Nisêbîn.

Komela Tebîbîn Tîr di rapora xwe de wiha dibêje: "Di herêma rîveberiya taybetî de mafîn mirovan têr xwarin, neheqiyez mezin heye. Zîlî û zordariyek xwirt heye. Xwediyê zilmê jin û mîran, zarok û mezinan ji hev cihê nakin. Hêzîn ewlekari zorê û tadê li doktoran dikin. Midûrê emniyetî doktorek sîrgûn kîriye, ji ber ku rapor daye mirovekî. Nexwesxana Nisêbîn gellek caran dibe qîse û bargeheke eskerî. Di herêma rîveberiya taybetî de doktor di nav talûkê de ne. Doktor li herêmê zêdeyê wextê qanûnî xizmetî dikin, perê distînî kêm in. Perê polîs û sawcî û

hakim dîgrin zêdetir e. Ji ber ku personelên sihetê kêm in, doktor gellek caran dest davêjin sehîn din jî ku ne karê wan e. Hekîm û xebatkarên nexwesxanan ji vê herêmê direvin. Doktor nikarin raporê objektîf û bê teref bidin xelkê. Tadek mezin li xelkê dibe."

Ji bo şertîn jiyanê û xanî û malan jî rapor dibêje: "Lojmanen herêmê kêm in, yê hene jî ewil didin personelên eskerî û hêzîn ewlekariye. Xaniyê bi dest doktoran dikin, ji aliye avê û elektrîk xerab in. Doktor inçex mehê carek karîn serê xwe bison. Ji bo wê jî diçin merkezekê 2-3 saetan dûr."

Ji bo raporan jî ev têne gotin: "Li herêmê birîndarî zêde ye. İnsanen laşen wî tije cihê lêdan û derbîn lêxistinê ne pirr têr cem doktoran. Mesela raporan bûye meseleyek me-

zin. Doktor di bin zorê de ne, ditîrsin rapor bidin xelkê. Polîs û hêzîn ewlekari, gava ku mirovek îskencexwari muayne dikin, dernakevin derve. Yan jî li derve xeber û gotinê nexwes dibêjin, dikin xirecir, ji bo ku doktoran di bin tesîrê de bîhelin."

Mesela otopsiyen jî problemekekî din e: "Carê wiha hene ku doktor otopsiyê nakin, xebra wan ji otopsiyen çenabe. Gellek otopsî bi tenê ji aliye sawciyan bê xebera doktoran têne kîrin."

Ji bo nexwesên ku nikarin bêlî ba doktoran jî ev heye di raporê de: "Nexwesên li derive jî serêsekê din e. Doktoran diçin ser nexwesekî, gerek e nexwesên xwe îxbar bikin, yê ku îxbar neke cezayê wî 3 sal e. Dema ku doktor li deriveyê nexwesxanê mirovan tedawî dikin, têne girtin û eziyetê dibînîn."

Erzîncaniyan bêhna Demirel teng kir

Hefta derbas bû Silêman Demirel û heyetek mezin li Erzîncanê bûn. Ji bo esasen xanî û malen nuh deynin hatibûn wir. Berî têkevin bajêr xelkê ew sekinandin û pankartên xwe rakirin. Di pankartan de ev tişt dihatin xwendin: "Em birçî ne. Rewşa dikan dar û esnafan pirr xerab e. Em di bin çadiran de şeperze ne."

Piştî Demirel û xelk bi hev re hatin meydana bajêr ji xelkê pankartên xwe dananîn. Gava Demirel xwest dest bi axaftina xwe bike hêrs bû û got: "Van sloganan deynin, me fêm kir, bes e."

Li ser gotina Demirel polîs hatin û xwediyê pankartan girtin.

Di ser zelzela Erzîncanê re sê mehîn temam derbas dîbin. Xelk bê xanî û bê cih in. Perîşan û şeperze ne. Ev ne bes bû, bi ser halê wan de jî wan digrin û dixin hebsan.

Li Tirkiyê îşkence heye

Heyetek ji Yekîtiya Miletan ji bo tehîqata îşkencê hatibû Tirkiyê. Heyet çend rojan li Tirkiyê ma û bi hin kesan re rûniş. Di nav kesen ku heyet bi wan re rûniş Wezîrê Dadmendiyê Seyfi Oktay û Wezîrê Mafîn Mirovan Mehmet Kehreman ji hebûn. Herwiha heyeta Yekîtiya Miletan serokê HEP'ê Ferîdûn Yazar ji dît.

Heyet li zîndan û girtîxanê zarakan geriya, ci dibe û ci nabe nas kirin.

Dewletê sansur danî ser rapora heyeta Yekîtiya Miletan û di wextê hevdîtinan de nehiş rojnamevan hazır bin. Di derheqê sansurê û midaxela dewletê de serokê heyetê Joseph Woyane xwe bêdeng kir û tiştîk negot.

Dewlet ferqê dixe nav girtiyên Kurd û Tîrk

Dewlet ferqê dixe nav girtiyên Kurd û Tîrk. Girtiyên siyasi û Kurd diperçiqnîne û wan ji heqîn hene mehrûm dike.

Hikûmetê qerar daye ku girtiyên zîndanan û merivên xwe rojêni pişti eydî karîbin hevdû bibîn. Belê Wezîrê Dadmendiyê qerar daye ku Kurden siyasi li derveyî vî heqî bihêle. Lewra giş siyasiyên dikevin ber madeya 125 an tev de Kurd in.

Îsmaîl Pehlîvan ceza xwar

Girgir kovareke mîzahî û pêkenokê ye. Îsmaîl Pehlîvan nîvîskarekî Girgirê ye. Berî bi du salan karîkaturek çêkiribû. Ev karîkatur li ser Turgut Ozal bû. Turgut Ozal ew daye mehkema İstenbolê û mehkemê ji sal û nîvek ceza jê re birriye.

Daxwaza Îsmaîl Pehlîvan ji bo ku cezayê razana di hebsê de bibe cezayê peran qebûl nebû û mecbûr e cezayê xwe razê.

Modelê FBÎ

Dewletê giş karêne xwe le aliyeke daniye. Di hisê dewletê de ji PKK'ê pê ve tu tiştîk û xizmeteke din nemaye. Mesûlekî dewletê ku li Kurdistanê rîberiya şerî taybetî dike vê dibêje: Eger di zemanê xwe de selahiyetek zêdetir dabûn qeymaqam û waliyan PKK dê ewqas xwirt nebûya. Hêzîn ewlekariye û yên istîxbaratê ne bi hev re hereket dikin, feiliyeta wan cihê ye. Divê em mîna modela FBÎ giş hêzîn ewlekariye di bin serokatiyekê de kom bikin. Divê em selehiyeta qeymeqam û waliyan zêdetir bikin û gerék destûra wan temam be."

Mesûlî şerî taybetî dom dike: "Li bajaran polîs û li derveyî bajaran li gundan jenderme li karêne ewlekariye dînerin. Ev yek dest û lingê amîrîn mulkiyê ango qeymeqam û waliyan girêdane. Amîrî mulkiyê nikare emir bide polîs û jenderman, nikare wan ceza bike, cihê wan nikare buguhere û wan rake ciheke din. Divê selahiyet û mesûliyeta mesûlî mulki mestir bibe."

Mesûl ji bo merkezeke li gora modelê FBÎ van pêşneyaran dike: "Têkîliyên walfi bi istîxbarata derveyî bajêr re wek tayên xav in. Xizmeten MİT ê nayen înkarkirin, belê iro ji MİT'ê pê ve istîxbarata wezareta derve, istîxbarata rîberiya eskeriyê, istîxbarata midûriyeta emniyeta gişî û ya serokayetiya jenderma ji heye. Ev mekanîzmên istîxbaratê her yek ji yên din cihê karê xwe dikin. Gerek mîna welatên Rojava istîxbarat bibe du beş. Beşa hundîr û yê derve. Ji bo me sistemeke mîna yê Amerîka FBÎ lazîm e. Kesên di vir de kar bikin gerek profesyonel bin, teşkilat li gora merkezê bêne avakirin."

Mamosteyan hikûmet protesto kirin

7'ê meha Hezîranê mamosteyen Sendîqaya EGIT-SEN ê çûn ber deriyê Wezareta Hîndekarî û Perwerdekariye û ew protesto kirin

Mamosteyan di derheqê sîstema xwendin û hîndekariye de pêşneyar û rexneyen xwe kirin: "Sîstema xwendinê kevin bûye, li pey zeman maye û bersîva iro nade. Ev sîsteme divê nuh bibe û li gora demê bê serbestkirin." Di derheqê sîrgûnkirina xwendevan de jî ev gotin: "Di van mehîn dawî de mekteb bûne qîse û gellek xwendevan ji mekteban hatine avêtin. Divê ev bêne sekinandin."

Mesaja Serokê ERNK Abdullah Ocalan ji bo gelê Kurd (3)

'Şoreşa Cotmehê di PKK de jiyan dibe'

✓ Dibe ku di nêrîna hinek kesan an jî hêzan de şoreşa Cotmehê ketibe. Lê hema di xebata PKK de û di şoreşa Kurdistanê ya mafdar de, Cotmeh bi ser dikeve. Berî bi 75 salan, dema ku ev şoreş bi rê ket, ji bo însaniyetê bû hêviyeke mezin. Gellek milet û gel li ser vê şoreşê rabûn, lê mixabin di dema niha de dixwazin wê serkevtina mezin înakar bikin.

✓ Em piştî 75 salan hebûna vê şoreşê dîkin hebûna xwe. Armanca vê şoreşê jî ji herkesî bêhtir armanca me ye. Em şoreşa gelê Kurdistanê dîkin şoreşa gelê Tirk, Ereb... em dîkin şoreşa hemû gelên bindest û welatên dagîrkirî.

✓ Belê, zor û zehmetî hene, di her şoreşî de zor û zehmetî peyda dibin. Em bi xwe şoreşa bê zor û zehmetî, ya ku ji xweber çêdibe, şoreş nahesibînin. Şoreş berî her tiştî xwîn e, zor û zehmetî ye, qehremanî ye. PKK vê şoreşê dimeşîne.

✓ Herkesî fedakariya şervanên PKK dîtin, kesê ku van tiştan bibîne ne mumkun e yek were pê bilîze, ji lewre me heyâ niha ev şoreşa kûr û fireh meşandiye.



SOREŞA

ROJHILATA NAVÎN

Belê hemû kesî dît çawa Sosyalîzma Reel hilweşîya. Bi vê hilweşandinê re jî ziyaneye berçav gihîste kelepora şoreşa Cotmehê (Oktoberê). Li ser bingeha vê hilweşandinê niha hinek kesen ku xiyanetê bi gelê xwe re dîkin, hikumdariya xwe dimeşînin.

Dibe ku di nêrîna hinek kesan an jî hêzan de şoreşa Cotmehê ketibe. Lê hema di xebata PKK de û di şoreşa Kurdistanê ya mafdar de, Cotmeh bi ser dikeve. Berî bi 75 salan, dema ku ev şoreş bi rê ket, ji bo însaniyetê bû hêviyeke mezin. Gellek milet û gel li ser vê şoreşê rabûn, lê mixabin di dema niha de dixwazin wê serkevtina mezin înakar bikin.

Em piştî 75 salan hebûna vê şoreşê dîkin hebûna xwe. Armanca vê şoreşê jî ji herkesî bêhtir armanca me ye. Em şoreşa gelê Kurdistanê dîkin şoreşa gelê Tirk, Ereb... em dîkin şoreşa hemû gelên bindest û welatên dagîrkirî. Çima? Ji ber ku ew gel ji me bêhtir di bin destê hovîti û dagîkeriya sistêmî faşîst de ne. Me berê got, dîsa jî dibêjin, eger gelê Tirk

biratiyê dixwaze fermo em amade ne. Lê hema ne biratiya ku yek yekî têxe bin destê xwe û xwîna wî bimije. Na, em biratiya li ser bingeha azadiya herdu gelan dixwazin, biraftî li ser esasê wekheviyê çêdibe.

Wê gelên Rojhilata Navîn û gelên din, wê di şoreşa Kurdistanê de hêza xwe bibînin. Niha Ereb li hemberê Îsraîlê, li hemberê Amerîka dîkevin tengasiyê, bi vê şoreşa me wê hêza wan li hemberê dagîkeran xwirt bibe. Dewleta Tirk zorê li Eceman dike, xwirtbûna şoreşa me hêzek e ji bo tirsandina dewleta Tirk... Kin were gotin, şoreşa Kurdistanê şoreşa Rojhilata Navîn e. Şoreşa Rojhilata Navîn jî dibe şoreşa Cotmehê ya nuh, ev şoreş jî dibe şoreşa însaniyetê ya hêfi mezin.

Belê, zor û zehmetî hene, di her şoreşî de zor û zehmetî peyda dibin. Em bi xwe şoreşa bê zor û zehmetî, ya ku ji xweber çêdibe, şoreş nahesibînin. Şoreş berî her tiştî xwîn e, zor û zehmetî ye, qehremanî ye. PKK vê şoreşê dimeşîne.

SERÊ GERILLA

Em hinekî li dîroka xwe

vegerin. Weke têzanîn damen PKK, ERNK... baş dizanîn ku, bêyi şerê gerilla ne serhildan dimeşe, ne dîplomasî dimeşe û ne jî siyaset dimeşe. Hemû tişt bi şerê gerilla ve girêdayî ye, şerê gerilla sebeba jiyanê ye. Bêyi gerilla jiyan qut dibe, lewma me di destpêkê de got gerilla jiyan gelê Kurd e. Ji bo hebûna gelê Kurd, ji bo qehremaniya gelê Kurd, ji bo jiyan gelê Kurd divê gerilla bimîne. Dijmin dixwaze ci planê bigerfîne? Dibêje şerê gerilla bisekinînin, hûn wekî din serbest in. Ev mumkun e? Ji sedî sed ne mumkun e! Çima? Ji ber ku dema şerê gerilla were sekinandin jiyan gelê Kurd tê sekinandin, divê ev tu caran neyê çekirin.

Gerek e kîmasî werine hilanîn, kesen zeyîf xwe xwirt bikin, girîng e di hemû aliyeñ welat de gerilla xwirt bibe, pêwîst e nîvî gelê Kurd bibin mîlis û bajar û gundan biparêzin.

SERÊ MÎLÎSAN

Mîlis kî ye? Ew di erdê xwe de karê xwe dike, li mala xwe ye, lê eger fersend dîbi ser dijmin de diçê, bi dizî bi eşkere xayînên dora xwe dikuje. Mîlis ev e, gelê

Kurd tev mîlis e. Ev heyâ niha bê tenzîm bû, lê ji niha û bi şûn ve tenzîm hate çekirin. Niha hemû însanên Kurd şervan in; zarok, kal, pîr... îro roj roja wan e, şer şerê wan e, her komek ji wan artêsek e.

Dema ku dosten me alîkariya me dîkin, ew alîkariji bo wan e. Kesen ku dixwazin li hember emperyalizmê û dagîkeriyê rabin, divê piştgirî û alîkariya şoreşa Kurdistanê bikin. Ev şoreş şerefa wan e, serkevtina wan e, lewma ew alîkariya xwe dîkin. Dema ku şoreşa me bi serkeve, me got mirovahî bi serdiikeve.

Me rastiya partiyê wiha dîtiye, wiha me soz daye gelê Kurd û hemû gelên bindest. Em li ser vê bîr û baweriyê meşîyan û dimeşîn jî, bi vî awahî me şehîd dan.

Herkesî fedakariya şervanên PKK dîtin, kesen ku van tiştan bibîne ne mumkun e yek were pê bilîze, ji lewre me heyâ niha ev şoreşa kûr û fireh meşandiye.

Soz soz el Soza destpêkê ya ku me daye gel, niha jî soza me weke wê sozê ye. Heya ku dilopek xwîn di canê me de hebe emê bi vê soza xwe re bin.. Dawî

Gulek ji gulên serxwebûnê

Dilbixwîn

Şev zivistan bû, ezman ji ewran avis bûbûn. Stérkan xwe di bin perdeyeke reş de veşartibûn û te digot qey di xewa mirinê de ne... Baranêku mîna tofanan dihate xwarê, zemîn di bin hêrsa xwe de bê nefes dihişt. Hinde caran şîqînî bi birûskan diket, tûrêjek û derzeke ronak sîngâ wan ezmanen bi kîn diderizand, gerdûn ron dibû... û kewte-kewt bi seg û kûçikên gund diketin. Belê, Kurdistan di xwirtaniya demsala zivistanê de dijiya.

Meta Zînê, ku derbasî 59 saliya xwe dibû, di nava nîvînê xwe de rûniştibû, ketibû deryaya xeyalan û kûr-kûr bi ser xwe de mijûl dibû. Mîna keseke ku li ber xwedê bigere û tote bike, dilê mirov pê dişewitî. Tenêbûn gellekî zor e. Zînê ev salek û heft meh in ku di hundirê vî xaniyê ker û korde, roj bi roj melûl û jar dibe. Mîrê wê berî îsal bi çar sal û û sê mehan, ji bajêr dihate mal, dem cejna qurbanê bû, bi rî ve otomobil teqle dibe, seriyê wî di bariya kursiyekê de çik dibe, mejî (mêjî) xwe di bêvilan re davêje û diçe ser heqîya xwe. Xwedê cihê wî bike buhuşt, mirovekî gellekî zimanxweş û dilsoz bû, heyâku cû rehmetê dilê tu kesekî ji xwe teng nekir. Nûr ji rûyê wî difiriya, wekî melaikan bû. Têye bîra min, dema ku em zarok bûn, ji me re çîrokên şevê bê stêrk digotin, em hîn dikirin çawa mirov ji şevan netirse û mîna guran li şevîn û şevîn reş bigere.

Belê, tu caran kenê apê Silo ji ber çavên min naçe. Çendî şerîn bûn ew şekirênu ku ji bajêr dihanîn! Me zimanê xwe di dor devê xwe re dibir û dihanî, me dalast û li ber apê xwe digeriyan: "Ez desten te radimûsim apê Silo, gulyek şekir bide min. Wê siba mirîşka me hêkan bike, ezê bidizim û bêyî ku kes bizanibe ji te re bînim..." Gopalê xwe davete nava çavên me û bi ser me de diqîriya: Hele... hele ji xwe re li zarokên axir zeman binêrin, ji niha ve hînî diziyê dibin! Were, ji te re şekir, lê hema hêkan nedize..." Rehma xwedê lê be, hîna tama şekirê wî devê min şerîn dike.

Piştî mirina Silo, Zînê digel kurê xwe Mehmûd, çend sal bi perişanî û belengazî derbas kirin. Dilê Zînê bi Mehmûd gelekî xweş bû. Di dilê xwe de digot: "Ez û Mehmûd xwe bi tenê ne, li vê dinyayê ew

✓ Dijminê me nahêle ku dayîk bi lawê xwe şâ bibin. Namûsa gelekî di bin lingan de diperçiqînin, mirov neçar dibe ku dev ji mal, dê, milk, mal û jiyana sexte berde û çeka şerefê hilgire û tola hezaran salan hilîne... Kurê Zîna bextreş Mehmûd jî ji bo tolehildanê çek hilgirt.

✓ Çare ci ye? Serçemandin û rev nebûn û nabine dermanê birîna me ya kûr û dirinde. Buhayê welat xwînê, ne her xwîn, xwîna ciwanan dixwaze, em ê bidin, em ê bidin... em ê bidin!

✓ Mirin ci ye? Rast e, gellekî giran û zor e, lê hema ji bo me dema ku dibe jiyan pirr sivik û hêsan e, çîma? Em bi mirina xwe jiyaneke bi şeref diafirînin.

tenê ji min re maye. Ezê keça apê wî jê re bixwazim û pişta xwe heyâ mirinê pê hil-peserim.

Ez bi qurbana serê Mehmûdê xwe bim, wê şûna bavê xwe dagire..."

Lê hema dijminê me nahêle ku dayîk bi lawê xwe şâ bibin. Namûsa gelekî di bin lingan de diperçiqînin, mirov neçar dibe ku dev ji mal, dê, milk, mal û jiyana sexte berde û çeka şerefê hilgire û tola hezaran salan hilîne... Kurê Zîna bextreş Mehmûd jî ji bo tolehildanê çek hilgirt. Çare ci ye? Serçemandin û rev nebûn û nabine dermanê birîna me ya kûr û dirind e. Buhayê welat xwînê, ne her xwîn, xwîna ciwanan dixwaze, em ê bidin, em ê bidin! Lî dîsa jî bi min giran di-

Zînê di nava nîvînan de xwe civilandibû ser hev. Lawê xwe yê ciwan dihanî bîra xwe kenê wî, bejn û bala wî, her du çavên wî yê ku herdem mîna heyyê vekiribûn... û simbelîn wî yê reş û tenik, mîna wêneyan, di ber çavên xwe yê melûl re derbas dikirin... Hêdî hêdî çav tijî hêstir dibûn û fîrmisk mîna lib û dilopên barana biharê li ser her du dêman pêl didan.

Yek ji karguzariya min ew bû, ku ez nûcuya şehîdbûna kurê Zînê Mehmûd (Akif) bi-gihînim meta xwe ya delal.

Mirin ci ye? Rast e, gelekî giran û zor e, lê hema ji bo me dema ku dibe jiyan pirr sivik û hêsan e, çîma? Em bi mirina xwe jiyaneke bi şeref diafirînin. Lî dîsa jî bi min giran di-

hat ku biçime cem meta Zînê nûcuya şehîdbûna rîheval Akif bidimê. Ji ber ku ez û hevalê nemir gelek caran em li gel meta Zînê di nîvînekê de raketibûn, gelo wê çawa zimanê min bigere û bibêje: "Akif şehîd ket meta Zînê?"

Min bi zor xwe gihande gund. Ez û hevalekî bûn. Bi rî ve gotûbêjeke dirêj li ser şehîdbûna Akif hate çêkirin. Me zarokiya wî dihanî bîra xwe, em li ser egîtî, dilsozî û dilêriya wî diaxifîn. Wisa jî, me herdu birhîn wî yê mîna pilingan, çavên wî yê ku agir jê difiriya... û gurçika wî ya ji pola dihanîn bîra xwe.

Belê, Akif; ji ciwanen pêşemîn bû ku ji gund derket û tevlî şoreşa serxwebûn û azadiya Kurdistanê bûbû. Ew

bû yê ku riya gund ji hevalan re vekir û pêsiya me ronahî kir.

Heya ku em gihîştin ber derîye Meta Zînê, em di bin şîngîniya baranê de şîl û pil bûbûn. Weke ku em nuh ji na-va avekî yan jî çemekî derke-tibin. Wisa li me hatibû.

Me hêdîka li derî da, tu deng ji hundir nehat. Wiha ji me re xwiya bû ku Zînê di xe-weke giran de ye, lê hema li dawiyê me tê derxist ku dûrbûna Akifê ber dilê wê ne-hîştiye ku xew xwe bide ser her du çavên nîvîçimî. Me dîsa lêda, dengek hat:

-Kî ye ew? (Dengekî pirr nîzîm û xemgîn bû)

-Em in yadê, ji kerema xwe re derî veke...

Hema hilpekiya, bi dilgesî rabû ser piyan û ber bi derî ve hat:

-Wey ez bi qurbana hevalen Akifê xwe bim! Ez bi dora we re bigerim, hûn çîma wisa şîl bûne, derbas bin... derbas bin, bêhna Akifê min ji we tê...

Em li rex meta xwe ya zi-man şerîn û gotin xweş rûniştin. Heya serê sibehê em digel hev di gotûbêjeke germ de bûn. Pirraniya pirsên wê bi vê nolê bûn:

-Êh de bibêjin ci xeber ji Akifê min hene?

Vê pirsê dilê me diguvaşte ser hev. Me nedixwest em di şeveke wiha kor de birîna wê vewxwîrin, lê me nedikarî ji ber meta xwe birevin. Li dawiyê, ji ber ku rastî nayê veşartin, min desten xwe di ser histuyê wê re xuşand û got:

-Me xebereke xweş ji te re aniye meto. Belkî hînekî bi te giran were, lê hema mîzgînek e, tacek e, şerefek e, her kes nikare wê taca şerefê bide ser serê xwe. Ma ji vê rûmetiyê bilindir! Tu hin ci dixwazî!

Meta Zînê baş têgişt ku zimanê me dixwaze ci bibêje. Hîzrîng û kesereke kûr kişand û got:

-Tu dixwazî ci bibêjî?

-Akif şehîd bû yadê!.. (Min got)

Kêliyekê bê deng ma, çav tijî hêstir bûn, lêv kenyâan, çavên xwe di çavên min de çik kirin, wekî ku bibêje: "Te dît Mehmûdê min jî çû!"

Seriyê min da ber sîngâ xwe, eniya min ramûsand û bi dengekî kelegirî got:

-Hûn jî Akif in, hûn jî mîna Mehmûdê min dilê min germ germ dikin. Lê daxwazeke min ji we heye. Hûnê vê gus-tîlka wî ya nîşanîyê bibin bi-din mala apê wî. Herin bibêjine dotmama wî (Xezal) Akif bi Kurdistanê re zewicî.



Em bi mirina xwe jiyaneke bi şeref diafirînin.

Partî, rewşenbûr û nivîskarêñ Kurd di berhem, pirtûk û weşanêñ xwe yên din de gellek caran behsa dîroka gelê Kurd û zilm û zordariya ku li ser Kurdan bûye û dibe dîroka. Gelek caran wiha tê gotin: "Divê em dîroka xwe, serpêhatiyêñ xwe baş bîzanîn. Ji bo ku şasî û xeletiyê dîrokê di pêşerojê de tekrar nebin, divê em dîroka gelê Kurd baş binixîn û ji dîrokê dersan derxînîn."

Helbet ev dîtin rast e û di cih de ye. Lê, heyf ku ev dîtin tenê gotin in û di pratiķe de şopa wî nayê xwiyakirin. Lewma di dîroka me de bûyer û serpêhatî tim wek hev in; Dagîrker xwîna gelê Kurd dirjînin, welatê wan tar û mar dîroka. Çend welatparêz radibin, çend partî têne damezirandin, çend kovar û rojnama derdixin, çend kesan organîze dîroka. Lê dema ku leşkerên dagîrkeran bi top û tanqîn xwe têñ, hemû partî û komel tevî mirovîn xwe belav dibin. Her yek li derekî Ewrûpa bîna xwe digire û cardin zû bi zû venagere. Heger rojekê vegere ji, ne ji bo xebata siyâsiye.

Ew rewş, di van sed salêñ dawî de, di dîroka Kurdan de gellek caran tê xwiyakirin. Hîn di destpêka sedsalê de bi

Welatparêzêñ Kurd û nirxandina dîroka Kurdan

M. A L I T U Y S U Z

Hemû partî û rêvebirêñ ku welat terk kirine, cardî venegeriyane û dîsa dest bi têkoşînê nekirine. Kî reviya ye, wî dest ji xebata siyâsi ku azadî ji xwe re kiriye armanc, berdaye. Tenê demekê bi xebata rewşenbîri ve mijûl bûye. Ev dîroka me ye. Û dagîrker ji dagîrkeren berê ne.

derketina rojnameya "Kurdistan, 1898-1902" ev rewş dest pê kiriye. Wek tê zanîn "Kurdistan" li derveyê welêt derketi bû. Hemû rewşenbîren mala Bedirxanan welat terikandibûn û xebatê xwe yên rewşenbîri li derveyê welêt domandibûn. Paş şikestina serhildana Şêx Seid, çend lawê wî û çend rîberêñ serhildanê ku xwe ji neyaran filitandibûn terka welêt kîribûn. Eynî rewş paş serhildana Ararat û Dêrsimê ji tê dîtin. Heta M. Nûrî Dêrsimî ji bi zor canê xwe filitandibû. Heger mirov li dîroka nuh binêre û behsa van bîst salêñ dawî bike rewş paş 12'ê Adarê 1971 û 12'ê İlone

1980 an ji dişibe wek bûyerên berê. Gellek Kurdên welatparêz û şoreşger berê xwa dan Ewrûpa û rojnamayêñ xwe li wê derê weşandin. Li Başûr û Rojhilata welêt ji rewş wilo bû. Çend caran M. Berzanî, C. Telebanî, Qasimlo û serokên din yên KDP û welat terkkiribûn, tê zanîn.

Bi kurtî, hemû serhildan û tevgerên Kurd bi awayekî hattine şikestin. Her têkçûnek ji xwe re qetliam û zilma nuh anîye. Dîroka me dîroka têkçûn û revê ye. Hemû partî û rêvebirêñ ku welat terk kîrine, cardî venegeriyane û dîsa dest bi têkoşînê nekirine. Kî reviya ye, wî dest ji xeba-

ta siyâsi ku azadî ji xwe re kiriye armanc, berdaye. Tenê demekê bi xebata rewşenbîri ve mijûl bûye. Ev dîroka me ye. Û dagîrker ji dagîrkeren berê ne. Heta roj bi roj ji berê xirabtir dibin. Nijadperestîya wan her roj dikeve formen nuh. Divê em Kurd li ser van herdu xalan bifikirin û dîroka xwe munaqeşe bikin.

Di van sed salêñ dawî de kî (kîjan partî û rîxistin) ji vê dîrokê dersen baş girtiye? Kê serpêhatiyêñ gelê Kurd û pirsgirêkîn wî bi ramyarîn rasyonalîst nirxandiye û şerî azadî û demokrasiye li ser vê bingehê afirandîye?

Ji bo avakirina civatek baş, qenc, azad û demokratîk, za-

nebûn, nirxandin û şiroveki-rina dîrokê pêwîstiyeke herfî girîng e û kes nikare li dij vê dîtinê raweste. Lê, mirov di-kare gellek ramanan li ser çawa-bûna vê nirxandin û şirovekirina dîrokê pêşkêş bike. Dîroknaşî yan jî zanebûna dîrokê çiqas pirsê civata me zelal kirine dikare bê munâq-şe kirin. Şirovekirina dîrokê mewzûyek fireh e. Li vê derê mirov li ser vê pirsê nikare pîr alî raweste. Lê wek ku li jor hate gotin, di dîroka me de, rev, xwesiparî (teslimkarî), bi neyaran re heval-bendî û reformîzm bûne se-demîn rewşa ku gelê Kurd iro têde ye. Bi kurtî dikare bê gotin ku sedemîn domandina dagîrkeriya iro, ji dîrokê ders dernexistin e.

Ew dîroka me û dîroka tev-gerên Kurd e. Lê iro ev rewş hatiye guhertin. Di tevger û têkoşîna Kurdan a iro ya nûjen de tiştik heye ku mirov pê kîfxwes dibe; ew jî ji dîrokê ders derxistin e. Ji bo azadiya gelê Kurd, têkoşîna ku iro tê dayin, ne tenê ji dîroka Kurdan a 30, 50 an jî 90 salî de, lê belê ji doh, sê meh, çar û deh sal berê ji dersan derdixe. Ji bo vê ye ku hiş-yarbûna gelê Kurd xwirt û têkoşîn roj bi roj bilind dibe.

'Ez bi Derwêşê Sado re bêbextî nakim Derwêş û hevalên xwe bi gelê Kurd re bêbextî kirine'

Dewleta Tirk ji dema damezi-randina xwe ve heta iro, li Tirkîye û li Kurdistanê tu car destûr nedaye jiyanâ tu rîxistin û hêzen ji derveyê kontrol xwe

Ew hêz legal an ji illegal, rîxistinê çînî (simf) an ji olî (dînî), yên Tirk bûne an ji Kurd, zêde ji bo dewleta Tirk ferq nekirine. An ew ji bo ber-jewendiyêñ xwe bikar anîne, an ji serokatiya wan tevgeran ji holê rakirîye û ew pelisandine.

70 sal e ev siyaseta bi xwîn û genî li dijî şoreşgerên Tirk û Kurd dom dike. Iro ji, tenê ev siyaseta devleta Tirk, parî sex-tekartir bûye. Ji alîyê din ve zordariya hezar salî hê girantir dom dike.

Dewleta Tirk, ji aliyek ve ji bo ku tenê welatparêzêñ Kurd in û ne di bin kontrola wî de ne û welatparêziya wan ji dil û can e, bi dehan kes ji gel dide kuştin û dikuje, ji aliyê din ve ji, bi hinek mirovîn ku bi "rewşenbîri" ya Kurdi hatine nasîn, dixwaze bi wan partiyeke Kurdi bide damezrandin ku bikaribe serxwebûna Kurdistanê ji biparêzin. Li ber çavan e ev parastina serxwebûne ne parasti-neke ji bo berjewendiyêñ gelê Kurd e, ev parastineke sexte ye û di bin kontrola dewleta Tirk de ye.

Mirov vê siyaseta dewleta

Tirk di dîroka PDK'de ji dibîne. Yêne weke Faîk Bucak, Saîd Elçi û Dr. Şivan ku ji berjewendiyêñ (menfeetîn) dewleta Tirk re xizmet nekirin, dewleta Tirk ew kuştin an ji da kuştin û ji holê rakir, ku di kuştina Said Elçi û Dr. Şivan de Derwêşê Sado roleke girîng lîstibû. Derwêş tenê, dizane pirsa qesas ci ye.

Piştî Saîd Elçi, Derwêşê Sado bû sekreterê giştî yê PDK. Mirov bêje PDK teslîm devle-ta Tirk kir, rastir e. Dewleta Tirk, piştî ku PDK gitte bin kontrola xwe, tîrsa wî tenê ma ji çepen Kurd. Pirraniya çepan ji sedemî cûnta 12 Adarê git-tibûn. Dewleta Tirk li ser navê Partiya Demokrat, belavok, ni-vîsindibûn, çep û sosyalîsten Kurd, xayîn ilan kîribûn. Belavokîn, serokatiya Parî ya Demokrat, bi endamîn xwe dabûne belavkirin.

Derwêşê Sado, di civîna Dî-yarbekir a fireh de, mecbûr ma û qebûl kir ku belavok ji MÎT'ê ve hatiye nîvîsandin. Lê li gora Derwêşê Sado ev belavok wî ji MÎT'ê nehanîbûn. Endamî Polît Buroya PDK, Nuh Ocal, ajanê MÎT'ê bû û wî ji zû de ji MÎT'ê ev tişt dihanîn. Lê li gora Derwêş, Melle Nuh Ocal ji PDK hatîbû "avêtin" lê yên di civînê de kes bi vî bawer nebû.

Pirraniya mirovîn ku di civîne de bûn tê gîhîstîn ku MÎT'ê hemû organêñ PDK girtiye desten xwe. Li ser vê yekê me hinêkan civîn terk kir.

Melle Nuh Ocal kî ye? Melle Nuh Ocal, ji mîrîn Eglê ye û imâm bû. Lê di salêñ 1969-70'ê de ji nava xwendevanêñ Fakultey TIB'ê dernediket, di meş û protestoyê wan de cih digirt, di semîneren wan de besdar dibû û di çalakiyêñ dijî faşîstan de ji bi wan, re bû. Pişî derbeya artîşa faşîst a 12'ê Adarê, sala 1971'ê hemû hevalên Melle Nuh hatin girtin, lê imametiya xwe demand. Pirr vekirî bû ku endamî Polît Buro ya PDK ro-la ajan û provakatorî lîstibû.

Li ser pirsa mirovîn di civînê de, Derwêş nikarîbû xwe biparêze û pirsa mirov bi MÎT'ê bazar dike ji, li wir go-tibûn. Min di nîvîsa xwe ya berê de behsa vî kîribû. Derwêş di şûna bersivê de çîroka jiyanâ xwe nîvîsandîye. Vê carê ji ev-qas, lê gellek tişt hê mane.

Ez careki din ji Derwêşê Sado re dibêjim ez bi te re bêbextî nakim. Lê te û hevalên xwe, we bi gelê Kurd re bêbextî kirine.

Gerek e hûn hesab bidin gelê Kurd.

Wahab Serîn

XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zilanî

Çepebast:

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1- Navê pirtûka / Bi-rayê bav.	1											
2- Xelkê Azerbaycanê / Sembola Kalsiyûmê / Da, dayê.	2											
3- Maes/ Nav-dank.	3											
4- Sembola Zirêcê (Qurşûn)/ Hewar, fi-xan/ Kingo-	4											
5- Navê pirtûka / Bi-rayê bav.	5											
6- Xwarin bê wî nabe/ Navê rojekî.	6											
7- Sembola İterbiyûmê/ Yek, yekemîn/ Daçekêk (edat).	7											
8- Sembola Zirêcê (Qurşûn)/ Hewar, fi-xan/ Kingo-	8											
9- Kesê serbixwe/ Celebek cîla.	9											
10- Dili, bendegêri.	10											



tina Abdullah. 5- Herêmekî li welatê me, di sala 1930 an de tê de serhildan çêbûye/ Cinav-ka kesane yekemîn. 6- Xwarin bê wî nabe/ Navê rojekî. 7- Sembola İterbiyûmê/ Yek, yekemîn/ Daçekêk (edat). 8- Celebek cîla, ji hîrî çêdibe/ Mirî, cendek. 9- Kesê serbixwe/ Celebek cîla. 10- Dili, bendegêri.

Serejêr:

- Vexwarineke bi alkol.
- Nezewicî/ Navekî mîran.
- Tamar, kok/ Sembola Çingo (Çinko)/ Endam.
- Erd, cih, war/ Namûs.
- Di sporê de

yên en dawî ji bo şampiyoniyê tên hember hev. 6- Li Rojhilata Navîn navê welate-kî/ Celebekî kişandina telgrafî. 7- Sembola Aktûnyûmê/ Sembola Îndîfûmê/ Kesên ku ji dê û bavekî bin (ji bo mîran). 8- Rêzekî ji Quranê/ Serokekî Kurdan, li Iranê li hember Şah serhildaneke xwirt kiriye û di sala 1930 an de şehîd ketiye, di wînê de tê dîtin. 9- Kingotina Erê. 10- Qerîn, deng. 11- Navê partiya Ozal. 12- Pereyên kaxiz, navê Kurdan lê kiriye.

BERSÎVÊN XAÇEPIRSA HEFTİYA ÇÜYİ:

Çepebast: 1- Pira Malabadê. 2- Arî/ Ekonomî. 3- NI/ Alot/ Tazî. 4- Amerîkan. 5- Org/ Ednan/ La. 6- Ma/ Av/ În. 7- Îstîda. 8- Np/ Livîn. 9- Îş/ Laf. 10- Orema/ Ar.


Serejêr: 1- Pandomîn. 2- Îrl/ Raspêr. 3- Rî/ Ag/ Se. 4- Am/ Aîl. 5- Mele Evdila. 6- Akord/ Ava. 7- Lotînî/ Ifa. 8- An/ Kanûn. 9- Botan. 10- Aman. 11- Dîz. 12- Îra

NEQUSK
Amadekar
Aram Çem



Hebûn wezîfeyek e
te divê bila kîliyek be

Goethe



"Tirkol Rabe, rûne, razel" Ev gotin jî ya Ataturk e.

Piştî guhên xwe birrî ji kerîniyê jî ket

Gotinek heye ku bi îcaze û destûra hêzên kedxwar ve hin kes dê partîyeke Kurdan ya nuh pêk bînin. Yen ku rûpelêñ hin kovar û rojnameyan de xwe didan pêş, dirêşa (çuvaldiz) kirêdara wê derketine holê, serê lixavî yê di destê dijmin de veşartine û xwe wek azadîxwaz û niştimanperwer didin ber çavê neteweyê Kurd.

Bes, gelê Kurd baş dizane ku di dîroka wî de ci alozi, nexweşî û belengazî hatibe serê wî, ji bê tifaqî û dubendiyê çebûye. Dîroka wî bi wan xeletî û xiyaneta ve tijîye.

Dîroka dînyayê sê neteweyê barbar nas dike. Ew ji Fars, Tirk û Ereb in. Gelê Kurd iro di bin dest û piyêvan her sê xwînrêj û xwînmêja de ye. Hemû mafêñ wî yêneteweyî, însanî (mirovatî) û demokratikî jê hatine standin. Ji ber vê zilm û zordariya kevnare, êdi roj bi roj dost û dijminen xwe, parti û pêşengên xwe çêtir nas dike û dihebine. Şivan û gavanêñ Kurdan jî êdi parti û pêşengên xwe nas dikin.

Her wekî têzanîn mezinê hemû heywanan sêr e. Kerê carekê xwest ku, sêr ji serokatiyê bixîne û xwe bixe cihê wî. Ji bili sêr ji hemû heywanan re xeber şand ku kombûnekê bikin. Roj û saetîn civîne diyarkirin. Bi heywana jî da bawerkirin ku ev kombûn bi

daxwaza sêr çebûye. Ji mişk bigirin heta pilingan hemû dest bi dest hatine hola civînê. Hemû jî di bin çavêñ xwe de li sêr digerin û wî nabînin.

Ker jî bijiyêñ (pirç) xwe daye sekirin, destekî nalêñ (nal) taze li piyêñ xwe kiriye, çavêñ xwe kildaye. Bi kurtî kar û barê xwe baş kiriye. Saeta axaftinê hat û derkete singê hevalen xwe.

-Her wekî hûn dizanin sêr tu mezinahiyê li me nake. Nayê nav xweşî û nexweşiyen me. Me li ber derbêñ dijminan naparêze. (Paş re jî dest avête methê xwe û zirta)

-Hem tu tiştê sêr ji yê te zêdetir nînî. Ew jî yekî wekî me ye. Ger ew bêje sermilêñ (yele) min hene, ev e bijiyêñ (pirç) min ciwantir in. Ger ew bawerî bi çengê (penc) xwe bê, min jî pêhn (tekme) hene. (Pehnek dudu avêtin hewa) Ew bêje nirî (kükkreme) ya min heye, ez jî dizirrim û zirra min ji bêhtir deng dide. (Du caran ziriya)

-Gelî hevalan, destê xwe bidin singê xwe û bêjin, ci tiştê sêr ji ya min zêdetir e.

Kêroşkek li sefa paşê rûniştiye. Bi çavêñ xwe ve hêdika girijî û keniya. Çavêñ ker pê ket û gote wî:

-Birayê delal, dê hema tu bêje ci tiştê wî ji ya min zêde ye. Kêroşka qirne dîstî

mêrxasiya sêr û ker bas dizanibû. Herdu ji nêzîk de nasdikirin. Tengayî û berfirehî dîtibûn. Ne xwest şerma wîbîne û wî fedî bike. Bi zimanekî nerm gote ker:

-Tu tiştê sêr ji yê te zêdetir nîne. Tişteke te jî ya wî zêdetir e. Ger ew zêdehî nebûna, tu bi kêrî mezinahiyê dihatî.

-Çi ye ew zêdehiya min?
-Ew guhêñ te zêde dirêj in.

-Ger kêmasî dirêjahiya guhêñ min be, ez dikarim wê zedehiyê jê bikim (bibirim).

Heywanan din jî hatin ser gotina kêroşkê û civîn belav bû. Her yek jî wan çû bingehê xwe. Ker jî hate rexê gund ser devê golê. Her du guhêñ xwe ji qırnê de birrîn û avêtin golê.

Çend roj şûnda ordekekî pîr bi keça xwe û du nevî (torun) yêñ xwe ve çûne ser golê. Ordeka pîr ma li kêleka golê, keça wê û zarokêñ (têjik) xwe ketin nav avê. Qederekê di nav avê de çûn têjîka guhêñ kerê dîtin. Vekêşan anîne ber dayika xwe û jê pîrsîn.

-Dayê ev ci ne?
Dayika wan jî ker nas nedikir. Gote zarokêñ xwe:

-Bibin cem pîra xwe ew di zane ci ye.

Zarokan her du guhêñ kerê anîne rexê golê ba pîre û jê pîrsîn:

-Pîre ev ci ne?
-Ev guhêñ kerê ne.

TÎR

Musa Anter



Zimanê dê

Niha ve bi kurdi zane lê bi Tirkî hîn nake. Carna, radyokey min a bîçük heye, ez dikim dawa wî ku bi Tirkî xeber dide lawik dibê lew lew lew. Yanî dişibîne dengê heywanan. Lî ku ez dibêm lawo ka tilika xwe bide min ez bixwim. Mal û milkê wî tiliya wî ye, ew jî wê dike devê min. Gellek caran ez jê re bi Kurdi distirêm ma stirana min ci stiran e. Ez ne Brahim Tatlıses im, heşê min. Ez Amedê jê re dibêjim. Hema ku ez dibêm "lê Amedê Amedê dibê tu beyreqa Kurdan e. Ala rengîn hildaye" ew lawkê yazde mehî hundîre çavêñ wî dikene û ji min re bi dest û lingan dilize. Gerçî berê jî min bi qîmetê zimanê zikmakî zanibû lê vî lawîkî ji profesorekî bêhtir ders da min. Qenc ez hîn bûm ku tiştek di ser zimanê diya me re tune ye.

İsal 63 sal, ez bûme hêsiyê zimanê Tirkî. Bê çawa hêsiyekî bi namûs hesîtiyê bi rast û rîhnî qebûl nake, ez jî hînî zimanê Tirkî nebûme. Erê Tirk dibêñ zimanê kurdi tune ye, lê ez bi ilmî dibêm zimanê Tirkî tune ye Hema di van 60 salan de min pênc zimanê Tirkî hîn kirin. Di mekteba pêşî de yek, di ya navê de yek, di lise de yek, di Üniversitê de yek û yek jî yên ji derve. Ne kesî emir daye Tirkan, ewan zimanê xwe wiha kir. Ji ber vê yekê ez nebûm niviskarekî qenc bi kurdi, ewan yasax kir û tirkiya wan jî ne tu gû bû evqas dehba min a îsal 60 sal bertelef çû. Ez ne xwe dipêsinin lê ez yeqîn dikim ku îsal 60 sal bi Firensawî, Ingilîzî, Almanî bi vê tebê daketima bi kîmanî ezê bibûma wek Viktor Hugo, Goethe, Jean Jacques Rousseau û Shakespeare. Lî çi fêda ji qewlê Nabi ve bi Tirkî dibê "Öyle bir nehri muazam gibi çuş etmiyem fakat heyhat kurak sahralardan akip geçmişem." Yanî ez wek çemekî mezîn im mesele wek Dicle û Firat im lê çi fêde ez di çolan re derbas dibim, kes ji min fêdê nabîne.

Tirkîyê jî ez kirim wek Dicle û Firat. Ji Kurdistanê derketim û ez ketim çolêñ Ereban ên xerab cih û bê fêde.

Ji ber vê yekê işê min zor e, fikra min û mêjiyê min Kurd e. Lî ez mecbûr dibim bi Tirkî binivisînim. Ji ber vê yekê ez dibêm işê min zor e. Nivîsê min giş tercumê ne. tercumê tu carî nabin wek eslê xwe. Ji ber vê yekê fileh û misilman dibêñ Quran û İncîl nayîn tercumê kirin. Ku bîn tercumê kirin wê cewherê wan winda bibe. Gerçi sebebîn din jî ji vî hawî re hene, hema ezê jî vê qebûl bikim. Ev nivîsandîn min ên bi tirkî ku rij in, bê tewâş in ji ber vê yekê ye; ez bi kurdi difikirim û bi tirkî dinivîsim. Çiqasî ecêb û zilm e. Ma kesî dîtiye ku nivîskarekî Alman bi fransewî şaheseran binivîse, yan jî yekî İtalyan bi yewnanî? Kî bêjê nebêjê wek min 60 sali di nav vî agirî de nemaye. Ez zanim bê ev ci agir e û zilm e!



Ker piştî guhêñ xwe birrî ji kerîniyê jî ket. Edî keran jî ew ne kirin nav xwe.

-Başe di nav ava golê da ci dîkin?

Pîre serpêhatiya ker, sêr û kombûnê ji serî de ji neviyê xwe re got.

Neviyekî wê jê pîrsî.

-Piştî ker guhêñ xwe birrî, heywanan ew kirin mezinê xwe an na?

-Bihêle mezinahiyâ heywanan, piştî guhêñ xwe birrî ji kerîniyê jî ket. Edî keran jî ew ne kirin nav xwe.

Kurên xelkê li navça Asyayê li bîrasî û pismamiya Tacik, Ozbek, Qazak û Tataran digerin. Hin jî lê digerin ku ev hîmî ku bi xwîna hezaran şehîd hatîye avêtin, hin bera (keviran) jê bikêşin û belav bikin. Partiyêñ gelê Kurd hene.

Hem ev partiyêñ ha bi şanahî (hêsanî) çênebûne. Ev qonax (merhale) ne ya bê tifaqî û dubendiyê ye.

Behzad Berçelanî

Hevpeyvînek bi rojnamevanê Riya Teze Prîskê Mihoyî re (2)

'Ji bo serxwebûn û azadiyê, pêşmerge bi çeka xwe û rojnamevan bi pênûsa xwe!'

● Em ji rewşa gelê me ku tê de dijiya gellekî dûr bûn. Me riya serxwebûn û azadiyê nedîtibû. Pişti dehan salan, cara yekemîn e di dîroka gelê me de, em riya serxwebûnê nas dikin û di wê riyê de dimeşin. Niha ci li Kurdistanê çêdîbe em pê dihisin, ev ji bo me ne tiştekî hindik e.

Riya Teze bi ci awayî dihate organizekirin, çend rojnamevan tê de dixebeitîn, nûçevanen we çend bûn... çavkanî û jêderên agahî û nûçeyen we ci bûn? Ji kermâ xwe re hûn dikarin bersiva van pirsan bidin?

-Di Riya Teze de çar bes hebûn. Beşî jiyan partiyê, beşî wêje û edebiyatê, beşî çandê û têkiliyan, beşî ekonomikî, her wisa beşî propagandê jî hebû. Her beşekî ber-pirsiyarekî wê hebû, ji bilî wan jî nivîkarên rojnameyê fermî hebûn. Wan bi berdewamî nivîs ji bo Riya Teze dinivîsin. Seroketiya rojnameyê ji sê kesan saz dibû: Redaktor, (sernivîsar) cîgîrê sernivîsar û katibê Cabdar. Hew jî wênekkê û kamaraman hebûn. Tenê heş (8) kes ji bo nivîsan di rojnameyê de dixebeitîn. Wisa jî xebatkarên din hebûn, ku li ser daktîlo û montajê kar dikirin.

Çapxane bi taybetî ji bo rojnameya Riya Teze bû?

-Na, çapxane ya Partiya Komunist a Ermenistanê bû. Hemû rojname û kovarên ku derdiketin di wê çapxaneyê de çap dibûn.

Bi kurtî ez bibêjim rojnamevan û xebatkarên din ên teknîkî ku di rojnameyê de kar dikirin, di navbera 14-15 kesan de bûn.

We li ser nûçevanan pirsî. Nûçevanen me yên taybetî tûnebûn. Me ji çavkaniyên dewletê nûçê û agahî distandin, bi taybetî jî Ajansa TASS ê ya lape mezin. Van çavkaniyan jî li gora siyaseta Sovyetê nûçê belav dikirin, wê ci fêdeya wan li me hebe! Di vî warî de rojnameya me gellekî teng û bê jêder ma. Dema ku me hinek tişten ku fêdeya me tê de hebû bi dest xwe ve dihanî, me nikaribû serbest di rojnameyê de çap bikira, ji ber ku nivîsen me di bin qelema dewletê re derbas dibûn.

Ango em dikarin bibêjin haya we ji pêşveçûnen ku li Kurdistanê çêdibûn tune bû?

-Rast e, me nizanibû li Kurdistanê ci diqewime, ci dibe, ci nabe. Belê, me dizanî welatê me Kurdistan e, em jî Kurd in, lê hema ev bes bûn?! Bê gu-

● Rojnameyên me, rojnamevanen me, kovar û weşanen me pirr bûne. Ji lewre divê rewşa wan ne weke ya berê be, berê girlî bûn, girîng e êdî xwe vekin, rastiya gel, mîla gel, berxwedana gel... û têkoşîna gel bînine ber çavan. Eger ev tune be, wer ji xwe re texmîn bike rojnamegeriya Kurdi miriye.

rewşê de gelên hejmara wan hindik perîşan bûn, ji wan gelan yek jî Kurd in.

Niha Kurd di neh (9) komarîn Yekîtiya Sovyetê (ye berê) de dijîn, mafê wan li tu deran jî nîne. Bi vî awayî hilweşandina Sovyetê ji bo Kurdan negatîv hat.

Ya duymîn; hilweşandina Sovyetê ji bo pîrsa Kurd û Kurdistanê deriyekî nuh û baş vekir. Berê Sovyetê tu caran ji bo pîrsa Kurdan gaveke baş ne avetiye, her tenê bi dilovanî lê nîhîriye. Ne tenê ev, dosta-niya dewletên dagîkerê Kurdistanê jî kiriye. Gelo, çima ketina Sovyetê ji bo Kurdan baş bû? Ketina Sovyetê, hişt ku guhertinek li dînyayê çêbibe. Ji bo nimûne, dema ku Sovyet hebû, hemû dewletên emperyalist bi tevayî hêza xwe alîkariya Tirkîye dikirin, ji bo ku bibe hêzeke xwirt di rûyê Sovyetê de, li Rojhilata Navîn.

Lê pişti ketina Sovyetê û hilweşandina Warso (Varşova), ew alîkariya ji bo Tirkîye nema tê tu maneyê. Ev ji bo têkoşîna gelê me fersendeke nuh e.


Pîrsa bingehîn ev e; bê Kurdistanê serbixwe û aza tu caran çare ji me re nayîn dîtin. Ji lew re divê berî her tişî em xwe bigihîn vê armancê, ne Sovyet, ne Ewrûpa û ne jî tu dewletên din, nikarin me ji vê rewşê xelas bikin, girîng e em xwe bi dil û can bi vê armancê ve girêbidin.

Li dawiyê em ji bo vê hevpeyvîne gellekî spasdar in. Hêvîdar in ku di dema pêş de em nivîs û berhemîn we di rojnameya Welat de bibînî.

-Ez jî we spas dikim ku we ev mecalâ ji min re vekir ji bo ku hinekî li ser rewşa Riya Teze û rewşa Kurden Sovyeta berê biaxfim. Ji niha û bi şûn ve ez xwe mîna nivîkar û rojnamevanekî rojnameya Welat dibînim. Ezê bi hemû derfet û imkanen xwe rîhevaltiya Welat bikim.

Serkevtina we di xebatê de daxwaza min e, her hebin ji bo serxwebûn û azadiya welat...

Hevpeyvîn: Dilbixwîn



Rojnamevan Prîskê Mihoyî

man na!

Em ji rewşa gelê me ku tê de dijiya gelekî dûr bûn. Me riya serxwebûn û azadiyê nedîtibû.

Pişti dehan salan, cara yekemîn e di dîroka gelê me de, em riya serxwebûnê nas dikin û di wê riyê de dimeşin. Niha ci li Kurdistanê çêdîbe em pê dihisin, ev ji bo me ne tiştekî hindik e.

Demekê berê me dîbihîst ku li Bakûrê Kurdistanê tevgereke şoreşgerî ji bo rizgarkirina Kurdistanê derketiye. Dewleta Tirk ew hêz weke hêzeke terorîst didan diyarkirin. Lî hema di vê dawiyê de guhertinek bingehîn kete nava weşanen Sovyeta berê jî. Me li vê dawiyê rastî derxiste meydânê ku ew hêz ne terorîst in û ne jî dixwazin Tirkîye perçê bikin. Partiya Karkerê Kurdistan rastiya xwe bi me da naskirin, ku ew Partiya serxwebûn û azadiya Kurdistanê ye.

Hûn rojnamegeriya Kurdi di dema niha de çawa dinirxînin?

-Ez dixwazim ji Sovyetê ve destpêbikim. Weke min li jor jî da diyarkirin, rojnamegeriya Kurdi li Yekîtiya Sovyetê ya berê, li gora armancê dewleta Sovyetê birêve diçû. Anglo rojnamegeriyeke girêdayî bû, ne

serbixwe bû. Ez dikarim bibêjim rojnamegeriyeke bu-roqrat bû, fro ew tiş jî nema, her wiha li derveyî Sovyetê jî ewqasî rojnamegerî pêşve neçûye, ji lewre ez dibêjim divê rojnamegeriya Kurdi ji nuh ve ava bibe.

Rojnameyên me, rojnamevanen me, kovar û weşanen me pirr bûne. Ji lewre divê rewşa wan ne weke ya berê be, berê girlî bûn, girîng e êdî xwe vekin, rastiya gel, mîla gel, berxwedana gel... û têkoşîna gel bînine ber çavan. Eger ev tune be, wer ji xwe re texmîn bike rojnamegeriya Kurdi miriye.

Di nîrîna min de pêwîst e rojnamevan bibe weke pêşmergeyekî. Çawa pêşmerge bi çeka xwe ji bo serxwebûn û azadiyê şer dike, divê rojnamevan jî bi qelema xwe bibe şervanekî azadiyê. Rojnamegeriya bu-roqratîk bi me nege-rek e, ev e me got em li Sovyetê bi ci awayî bûn, me tu fêde dît? Na, ji bilî zirarê me tu fêde nedît.

Ez dibêjim, gerek e rojnamevan bi gel re derbasî nava mirinê bibe, bi çavên xwe ês û derdê gel bibîne, nalîna gel bi-zanibe û gav bi gav bi gel re bimeşe, wisa dikare bibe rojnamevanen gel, ji xeynî vê ni-

kare tiştekî bike, her wiha nikare bibêje ez rojnamevanekî Kurdi im, mafê wî tune ye.

Niha mirov dikare li ser ge-lek tiştan binivîse, materyal gelek in. Ne wek li cem me li Sovyetê, li wir em mecbûr dikirin ku em li gora plana wan binivîsin. Digotin hûn mecbûr in li ser Kolxoze binivîsin, bel-kî dilê min dixwaze ez li ser berxwedana gelê xwe binivîsim, nedîhîstîn, em girêda bûn.

Ji bo vê yekê ez dibêjim he-ya ku em ji dil bibin rojnamevanen gel divê bi dil bi gel re bin.

Pişti hilweşandina Sosyalîzma Reel, rewşa Kurden li Yekîtiya Sovyetê ya berê çawa ye, guhertinan hîkariya xwe li wan jî kir?

-Bê guman wan guhertinan li Kurden jî tesîra xwe kir. Kurden li Yekîtiya Sovyetê ku perçekî gelê Kurd in, tenê ser-bestiya xwe ya fizikî bi dest xwe ve anîbûn, Kurdiyiwan ewqasî ne xwirt bû. Lî belê, çand, ziman û wêjeya xwe parastin û hinekî jî pêşve birin.

Em dikarin hilweşandina Sovyetê ji du aliyan ve binirxînin: Yekemîn; ji bo Kurden li Sovyetê ev guhertin ne baş hat. Hemû gelên li wê derê di-man ku xwedi ax bûn, doza serbestiya xwe kirin, di vê

J i e d e b i y a t a d i n y a y ê

Wolfgang Von Goethe

Çilkezi Keskin

Goethe, sala 1749 an hate dinê. Mamosteyê wî yê ewil bavê wî bû. Li ber destê bavê xwe seyên (dersên) latînî, italyanî, yewnanî, fransewî û ibranîkî (cihûkî) xwend. Di zaroziya xwe de berhemên klasik ên yewnanî xwendin û dersên resimê standin. Wê demê gellek di bin hîkariya (tesîra) çirokên Almanan yê gelêrî de ma. Pişti van dersên pirralî Goethe bi daxwaza bavê xwe dest bi perwerdeya hiqûqê kir, ji aliyê din ve ji dersên wêjeyê (edebiyat) taqîp dikirin.

Goethe bi nêrîn û dîtineke pirralî û hewldaneke mezin xwestiye ku di her warê ilm û huner de bibe xwedî zanîn û xwedî gotin. Goethe di warê fîrbûna ilm de çalakiyên (faaliyet) xwe pirr fireh domandine û bi ser ketiye, gihîstiye armanca xwe. Berhemên ku Goethe afirandine jî wek wî pirralî ne.

Di gellek şax û babetî de nivísiye û xebitiye. Goethe helbest, roman, destan, şano (tiyatros), nivísen ceribandinê nivísiye, berhemên wî yê za-

niştî jî, di derbarê botanîk (rehiknast), jeolojî (erdnast) û anatomî de hene. Hinek berhemên wî bi navê xwe ev in: Şîrî û heqîqet, Geşta li İtalya, Dîwana Rojhîlat-Rojava, Salen şagîrtîtiye hoste Wilhelm, Gotz von Berlîchingen û dest hesin.

Taybetiya ku navê Goethe xistiye nav edebiyatê awayê nivîsîna wî ye. Goethe bi awayê nivîsîna jînî nivîsiye. Yanî bi şeweyekî pirr bi wate (mane) rastiyê di warê hunermendî de aniye ziman. Di wêjeya Almanî de klasîszm bi Goethe re dest pê kiriye.

Di berhemên Goethe de dewlemendiya hest, şewq û dilgermî, azwerî (tutku), hezkirina xwezayê û zarokan, baweriya dînî ya panteft (Dîtina felsefi ya ku xwedê û kaînatê bi hev ve girêdide û wan

yen dihesibîne), rexnegirî li dijî saziyên civakî, wek taybetiyen xweser (karekteristik) derdi Kevin meydanê û xwe didin xwiyakirin. Di huner û edebiyata Goethe de mirovîn çalak û aktif û yên xwedî hewl cihekî pirr girîng digirin.

Di dema cenga Fransa-Almanya ya 1770 an de, ji ber ku Goethe helbesten ji bo cengê nenivîsiye rexne lê hattine girtin. Wî jî li hember van rexneyan ev bersiva jîrîn daye: "Ez nikarim li ser hesteke ku di jiyana min de cih nagire helbestan binivîsim. Ez nikarim ji Fransizan nefret bikim, ji ber ku ez deyndarê çanda (kultura) wan im."

Çend gotinê Goethe: "Tu dewlet heta dawiyê li hember reweke bi mebesta xweparastinê hatiye sazkarin û çek-



Wolfgang Von Goethe(1749-1832)

darkirin nikare xwe bigire."

"Hebûn wezîfeyek e, te divê bila kîliyek bc."

"Jiyan berxwedan e."

"Dema li xwe ewle bibî tê bizanibî bijî."

Di dawiyê de tiştê herî gi-ring = Ber bi pêş ve!"

Wolfgang Von Goethe du-sê roj pişti temamkirina ber-hema xwe Faust, di 1832 an de çû ser xweşîya xwe.

Gelek leyistin li gund û bajaran hene û her nayêne hejmartin. Awaza leyistinê kurt e têksta wê ji kurt e, carna dirêj e. Ew jî li ser naveroka leyistinê dimîne. Naveroka wê bê sînor e, bi ken û henekan tête stirandin.

Ev babet (mewzû) li nik zarok û mezinan hêja ye, hê jî maye û winda nebûye. Lê bi derketina "vîdyo û data" piçekî kêmîtir bûye û cihê mixabinê ye ku iro em kêm pûte pê didin!..

Naveroka leyistinê digel sti-randinê bûye pênaşa 'leyistinê' û hemû ji bo kêf, xwesi henek û leyistinê û bi taybefî li demen vala. Kareki baş e, ger leyistikên me bi bingeh û zanistî bêne parastin, wisa weke film, vîdyo, kasêt, pirtük, kovar û hwd.

Nimûne

Wekî min got û hûn dizanin ku nimûne mişe (gellek li hejmartinê) ne û her ne weke hevin, êdî li kêmahiyê nenêrin! Di-gel vê jî li nimûneyen ku min ji xwendevanen re berhev kirine belkî ne hêja û girîng in, lê belê ji bo têgihîstinê (famkirin) ne...

1-Hebê û Lebê, ji zaxoka Behdinan

Kur: Hebê û lebê

Keç: Jarê Hebê

Kur: Mestir ne bê

Keç: De b'la we bê

Kur: Her hinde bê

Keç: Bo me û te bê

Kur: Isal bû çend?

Keç: Isal bû yek

Kur: Yekî me û her yê Xuda

Hebê û lebê

Folklor Botan (12)

Stiranê leyistinê



Keç: Jarê Hebê

Kur: Isal bû çend?

Keç: Isal bû du

Kur: Duyê me û duyê hejar

Yekî me û her yê xuda

Hebê û lebê

Keç: Jarê Hebê

Kur: Isal bû çend?

Keç: Isal bû sê

Kur: Siyê me û siyê Bihar

Duyê me û duyê hejar

Yekî me û her yê xuda

Hebê û lebê

Keç: Jarê Hebê

Kur: Isal bû çend?

Keç: Isal bû car

Kur: Çarê me û çarê Hawar

Siyê me û siyê Bihar

Duyê me û duwe Hejar

Yekî me û her yê xuda

Hebê û lebê

Keç: Jarê Hebê

Kur: Mestir ne bê

Keç: De b'la we bê

Kur: Her hinde bê

Keç: Bo me û te bê

2- Hawara me, Girkê Emo

Kesê 1: Hawara me bidêne Alla, M'hemed selêne Selêne ma pirtêne

Kesê 2: Pirtêne têlewanî Têlewanî cigcig e Cigcig e wey malig e

Kesê 1: Çin çin

Çewa çin

Sûret derbet leka çin

Kesê 2: Çiklêtên Yasînî ne

Helawa teébirî ne

Sirmê ewraha

û hwd...

Beşîr Botanî

Kovareke nuh

Roja 1'ê Gulânê 1992,
Partiya Azadiya Kurdis-
tan- PAK (Rêxistina
Ewrûpa), hejmara yeke-
mîn ji kovara xwe SER-

HILDAN derxist.

Kovar; bi kurdî (zara-
vayê Soranî) ye. 58
rûpel in, her du ber-
gâyên wê rengîn in. Na-
veroka wê giranî daye
pirsa siyasi li Kurdis-
tanê, têkçûna siyaseta
otonomizmê li başûrê

Kurdistanê... şoreşa
serxwebûn û azadiya
Kurdistanê li Bakûrê
welat. Her wisa jî hinde
wêneyên karikator û
hevpeyvînek bi hozan-
van Ehmed Dilzar re û
gelek nivîsên cûrbecûr
weşandiye.

Em bi navê xebatkarêñ
rojnameya Welat ser-
kevtinê ji "Serhildan" ê
re daxwaz dîkin, pîroz
bel

Tevî silavêñ şoresgerî



Li Qazakistanê kovara 'Kurd'

Hejmara kovarê Kurd yeke din jî
zêde bû. Ev kovara Kurd li paytextê
Komara Qazakistanê Alma-Ata hejmara
xwe ya yekemîn bi zimanê
kurdi û rûsi weşand. Wek redeksiyona
kovarê di pêşgotina ji bo
xwendevanê de dinivîse, gelê
Kurd herdem rûmeta xwendin û ni-
vîsinê girtiye, lê zordariya ji hêla
dijmin û neyaran ve rê li ber girtiye,
nehiştîye ew li gorî daxwazên xwe
çand, dirok û zimanê xwe pêş ve
bi. Çendî derfet tunebûn jî, lê
ronakbirêñ gelê me yêñ bi nav û deng
xezîneya çanda cihanê bi afiran-

dinên xwe ve dane xemilandin.
Îro gelê Kurd hişyar bû ye, ew
ne tenê ji bo serxwebûn û azadiyê
şer dike, herwiha ji bo pêşvebirina
çanda gelêri ji têkoşîneke girîng
di meşîne.

Armanca Kovara "Kurd" ci ye?

Bersiva vê pîrsê em di rûpelê
kovarê, yêñ pêşin de dixwinin. Berpir-
siyaren vê weşanê karekî bi rûmet û
serfiraz danîne pêşîya xwe. Ew ar-
manca vê kovara nuh, di ronikirina
gellek pîrsen dirok, ziman, wêje, to-
re û çanda gelê Kurd de dibînin. Bi
vê yekê re kovar li ser pêwendiyen

teví kovar û rojnameyên
kurdi yêñ di welat de û
derveyî welat radiweste û
dixwaze danûsitendinê
hêja û pêwîst çêbîke di
navbera Kurdên Yekitiya
Sovyet a berê û rêxistinê
Kurd yêñ li welatêñ
Ewrûpa de.

Di vê hejmara kovara
"Kurd" de, gelek gotar,
lêkolîn û nûçeyên
cihê, cihê yêñ ku li ser
çand, dirok û zimanê kur-
di ne hene. Prof. Kinyaze

Ibrahimî li ser jîyan û kar-
kirina rewşenbirekî Kurd
ê bi nav û deng Wezîrê
Nadirî dinivîse. Xwendevanê
kovarê ji vê gotarê
gellek pîrsen wisa re dibî-
ne nas, ku bi jiyana vî mi-
rovî re girêdayine. Wezîrê
Nadirî di sala 1930 an de
ketiye nava karê
pêşxistina wêje ya kurdi li

xwe de li zanîngeha amadekirina
mamosteyan de ya li Rewanê
dersen zimanê kurdi daye. Pişî wê
ew çend salan li navçeyên Ermenî-
stanê dibe berpirsiyarek xwendina gel.
Ji bili vî karekî pêwîst Wezîrê Nadirî
di nava wêjeya kurdi de zanebûnên
xwe kur dike, li ber destê zimanâ-
neyê di cihanê de bi nav û deng
Hiracîya Aşaryan, li ser afirandinê
helbestvanê mezin Meleyê Cizîrî
xebata doktoriyê amade dike. Wezîr
gellek ziman zanibû. Ew gellekî baş
bi zimanê Ermenî, Tirkî, Azerbay-
canî, Rûsi, Farisi û Fransî dizanibû.
Bi şewra mamosteyê xwe Wezîrê
Nadirî di fakulteya Rojhilatîzaniyê
ya zanîngeha Rewanê de dersen
zimanê Farisi dida xwendekaran.

Wezîrê Nadirî ne ku tenê Kurd-
zane bû, lê wisa jî helbestvanekî
naskirî bû. Di sala 1935 an de piyes
(tiyatroy) a wî bi navê "Reva Jinê" û
pirtûka helbesten wî ya "Nûbar" çap
dibin. Lê di sala 1961 an de pirtûka
wî ya "Welat û Evin / Weten û Hib"
panzdeh salan pişî mirina wî çap
dibe. Wezîrê Nadirî di sala 1946 an
de ji hêla hêzen nedîyar ve tê kuş-
tin.

Di vê kovarê de ji bilî Kinyaze
Ibrahimî, Eskerê Boyîk, Babalyê Ke-
leş, Pirîskê Mihoîy, Ibrahimî
Mehmût, Temûrê Xelîl, Dr. Çer-
kezê Reş, Prof. Şekroyê Xudo, Prof.
Maksûmê Xemoyî û Prof. Celîlê Ce-
lîl li ser pîrsen cihê-cihê gotar û
lêkolîn nîvîsi ne. Gelek wêneya
kovar xemilandine.

Kovara Kurd weşana Yekitiya
Kurda ya "Yekbûn" e. Navîşana
wê di qapax de ye.

PÊNÛS

Amed Tîgrîs



Rojo

He 10-15 sal berî niha, ji derî çend politîkvan û ronakbirêñ
Ewrûpiyan kêm kesan Kurdan nas dikir. Dema Kurdeki bigota "ez
Kurd im" xelkê Ewrûpi matmayî diman û carna dipirsin: "Kurd li ku di-
jin, li Afrika na jî Amerika latîni?"

Lê, iro li seran serê Ewrûpayê rewş hatiye guhertin. Di van çend
salen dawî de, ew bûyerên mezin û girîng ku li Başûr û Bakûrê Kurdis-
tanê pêk hatin û hîn jî tê, tesireke mezin li Ewrûpayîan kir û dike.
Yêñ ku dengen-bûyer û kîrinê li welêt digihînîn Ewrûpa dîsa Kurd bi
xwe ne. Iro li hemû Ewrûpa 800.000 zêdetir Kurd hene. Ev hejmareke
gellek mezin e. Hejmara Kurdên li Ewrûpa ji çend dewletên Ewrûpi
pirrit e. Ev civata Kurdan a li Ewrûpa, bi hemû kil û kîmasiyêñ xwe ve
civateke, bi hejmar, dinamik û bi rêxistinî ye. Civata Kurdan a li
Ewrûpê, di eyî demê de olana (yankiya) bûyerên li Kurdistanê, li
hemû Ewrûpa belav dike. Ew tesîr li ser çapemenî, politîkvan, raya
giştî û hikûmetê Ewrûpê dike. Ya heri girîng êdî xebata Kurdan li
Ewrûpa di nav xelkê de bingehê xwe davêje û reh dide. Ez dixwazim
di vî warî de minake biçûk bidim.

Şagirteki (telebeyeke) min heye. Navê wî Rojo ye. Ew li Stock-
holmê diçe sinifa pêncan. Bavê Rojo Kurd e û diya wi jî Swêdî ye. Du
hette berê, Rojo ji min re got : "Divê tu hinek alîkariya min bikî, ez dê
di sinifa xwe de li ser Kurdan agahdarî bidime hevalê xwe yên sinifê."

Rast e, li Swêdê zarokên biyaniyan salê carek an du car li ser welat
û kultura xwe agahdarî didin hevalê xwe yên sinifê. Em çûn sinifa Ro-
jo. Sinif tije bû. Mamostayê cihê xwe da Rojo. Rojo berî nexşeya (xer-
ita) Kurdistanê ya mezin bi texte daleqand. Kaseta Kurdi ji kire teyîbê.
Rojoyê me dest pê kir, Kurdistan li ku ye. Çend km2 ye. Çend milyon
Kurd hene. Kurd di nav kîjan dewletan de hatine perce kîrin. Zimanê
wan çawa ye. Ji wan re bi kurdi got (rojbaş). Ji yekê heta dehan jimart.
Alfabeya Kurdi li sinifê belav kir... Rojo dom dikir:

"Ez par çûm Kurdistanê, welatê bavê xwe. Welatê bavê min nêzî ci-
yayê Agirîye ye. Agirî pirr bilind e. Havîn bû, lê hîn serê wî bi berf û mij
bû. Ez çûm gund. Gelek xweş bû..."

Li Ewrûpê bi sedan, bi hezaran Rojo hene. Beyanî (sibehê) Rojo
mezin dibin. Hevalê Rojo ji mezin dibin. Ew dibin mezinê welatê
xwe.

Rojnameya 'Kurdistan'



Navîşana xwestinê :
Kazakskaya Respublika
G. Alma-Ata, 35
8 Mikrorayon, 56, Kom. 301





E. Xanî ramanwêrekî mezin û fi-lozofekî dûrbîn e. Ew pêşerojê dibîne û pêşerojê dirame (difikire). Hozanê mezin bi hestekî netewî li zimanê Kurdi xwedî derket û ji bo pêşvebirina wî ket nav hewldanêne mezin; çalakîyen giranbuha nişan da. Ew mîna hinikan li pey nasnameyeke ilmî ya erzan negeriya û bi pey nav û deng neket. Bêguman wî ji dikaribû bi Erebî an bi Farisi bî-nivisiya û di riyeke kurt de bîghîsta nav û deng Heta wî ji dikaribû Mem û Zin ji van zimanan bi yekî binivisiya û ev destana Kurd ji biyaniyan re bikira mal; lê E. Xanî ev yek nekir û li pey tiştîn erzan bazneda. E. Xanî berjewendiyen gelê Kurd û Kurdistanê di ser hemû tiştî re dît; bi tekoşîn û ramanen xwe ji bo avakirina dewlekette netewî a Kurd xebî. Helbestvanê nemir di beşê "Sebebê Nivisîna Pirtükê Bi zarê Kurdi" de ewha dibêje:

Xanî ji kemalê bê kemalî Meydana kemalî dîfî xalî Yanî ne ji qabil û xebîrî Belkî bi teesib û eşîri Hasil: Ji inad, eger ji bêdad Ev bidete kir xîlafê mudat Safî şemiran vexwari dûrdî Manendê durê lisânî Kurdi İnaye nîzam û intîzamî Kêşayê cefa ji boyê amê Da xelq nebêjin ku Ekrad Bê merifet in, bê esl û binyad Enwaê mîlet xwedan kîtêb in Kurmanç tenê di bê hesêb in

Li ser şopa Ehmedê Xanî

Hem ehlê nezer nebên ku "Kurmanç"

Işqê nekirin ji bo xwe amanc (15)

Dema ku mirov van rîzan dixwîne, mirov dibêjê qey ku E. Xanî hê ji 300 sal berê de roja îroyîn dibîne û li ser diaxife. Ma bi rastî ji dîjî minen gelê Kurd nabêjin "Kurd bê dîrok, bê merifet, bê esl (nîjad) û bê binyad (bingeh) in. Dîsa ew nabêjin Kurdan xebatên ilmî ji xwe re nekirine kar û heyâ niha bi zimanê Kurdi tu xebatên edebî û zanistî nehatine kirin. Ma gelo ev riya ku E. Xanî vekir bi salan xitimî ne-ma û Kurdan bi zimanê xwe binivisiya, dê iro' rewşa me ewha bûya? Bêguman na!

E. Xanî û zimanê Kurdi

Du hêmanen girig ên netewbûnê hene: Yek, ziman û yek ji aya (erda) ku mirov li ser dijî. Ziman navgîna axaftin û li hev kirinê ye. Axa ku mirov li ser dijî welat e. Endamên netewekî zimanekî diaxifin ku ji viya re zimanê zikmakî tê gotin. Zimanê zikmakî zimanê dê ye û bingeha çanda netewî li ser wî awa-dibe. Ango ziman û çand ketine hundîre hev; ji hev nayê qetandin û cudakirin. Ev herû hêman wisa di hundîre hev de ne ku ji hev cihêkirina wan pîr dijwar e. Herwi-

Felat Dilges

ha ziman û raman jî bi hev re girêdayî ne; mirov bi zimanê zikmakî dirame.

İro li dinê, di şûna zimanê İngiliz de peyva "Çanda İngiliz", di şûna zimanê Fransî de peyva "Çanda Fransî", di şûna zimanê Almanî de ji peyva "Çanda Almanî" tê bikaranîn. Ev ji bo zimanen dîjî ewha ye. Lewra gava ku mirov zimanê netewekî fêr dibe, herweha mirov awayê jiyana wê netewî ji hîn dibe û di dermafê jiyana wî de ji dibe xwedî agahdarî. Bi vî awayî di ciyê zimanê Kurdi de, em dikarin peyva "Çanda Kurdi" bikarbînîn.

Netewekî ku li zimanê xwe xwedî dernekeve nikare hebûna xwe bi-parêze. Hebûna netewî bi ziman û çanda netewî tê parastin û bi van ve girêdayî ye. Di dîrokê de ew gel û netewen ku li zimanê xwe xwedî dernekette, ji hev tarûmar bûne; ji "sehna" tarîxê vekişiyane û ji aliyê ji wan bi hêztir ve hatine bişraftin.

Ziman bi ci tê parastin û bi ci awayî pêşve dije? Ziman bi axaf-tin tê parastin û bi nivîsinê pêşve dije. Zimanekî ku pê neyê axaftin, di jiyana rojane de neyê bikaranin û

AZADÎ

Abdurahman Durre



Cejn û Eyd

S aîrekî Kurdan, li ser eydiyê wiha gotiye: Gerçi iro eyd lêkî, cergê min ateş ketê

Dil, tehemul naketin seyr a ryadê cenetê

Min hebîb windaye weyla ketme pêta firqetê

Ez xerîb im, ez xerîb im, ez xerîb im, ez xerîb

Yanê dibêje: Herciqas ku iro eyd e ji, lê kezeba min agir ketiyê, dilê min tehemula geşt û seyra baxê bihişte ji nake, lewra yara min winda ye, ji min dûr bûye, ji ber wê ez ketime nav pêt û agir, ji hevgetandin û dûrtiyê. Ez xerîb im... xerîb im, xerîb. Weyla li min bê kes û bê yarê, bê cih û bê warê.

Bi rastî ji ku mirov ji yar û warê xwe dûr be, cejn û eyd li mirov dibe weke cehenem.

Bi çiya û ber û warê te me sond û qesem e

Ku ne warê te be dinya li me zîndan û xem e

Xerîb im bê xwedî mame, ku bê war û welat im ez

Kejb im dil kul û jan e, qilingê rojhîlat im ez

Seri çile ji derda me, melê bê laçik û şas im

Ku hê dîlê ne merda me, dinalim, Kewrûbat im ez

Bi vê cejnê çikim seyda, divêm cejna serefrazî

Ku lê yara welat mey da, bi ferman û berat im ez

Xwendevanê hêja:

Ez li ser navê xwe û Rojnameya Welat cejna we pîroz dikim, hêvidar im ku em di cejn û Newroza serefrazî û azadî de bi hevdure dîlxweş û dilşâ bin, pîroz û aza bin,

Qibla me ye Sîpan û Bilîcan û Şerefdîn,

Nemrût Erefat e

Ke'ba me ye, Şengal û Cilo, Cûdî û Hemrîn,

zemzem ku Fîrat e

Zozanê welatê me hemî Quds û Herem tê,

Pîroz heye herder

Dermanê dilê rîşê me her qît û kelem jê,

melhem heye ku l'ser

Wesyet li we be hûn me li aya wî hişnîn,

bîrim li ci erdî

Helbestê Cegerxwîn û Mem û Zinê bîxwînîn,

telqînê bi kurdi

Belê xwendevanê delal hêvî û rica min ji hemû gelê Kurd ev e ku, piştî mirinê ji em hev ji bîr nekin.

Welat, qîbla dil û can e ezel da min berî dayê

Xebat lê dîn û iman e, tebat, bê wî li dil nayê

pêşveçûnêkî bêhempa nîşan daye. Ev kulam çîrok, matelok, gotinê pêşîyan, têderxistinok...û hwd ên ku li Kurdistanê tên gotin bi salan bênen berhevkirin naqedin. Her gund, her bajar û her deveren Kurdistanê di vê mijarê de xwedî dewlemedîyen mezin û xweser in

E. Xanî xwedî hesta dewle-mendbûna zimanê Kurdi ye. Lewra em ji berhemên wî ji têdgîhîjin ku E. Xanî di mijara zimanê Kurdi de xebitî ye û di vî warî de pispor e. E. Xanî di rîzîn:

İnaye nîzam û intîzamî

Kêşayê cefa ji boyê amê (16) de beyan dike, beriya ku dest bi nivîsina vê pirtükê (Mem û Zin) kiriye li ser zimanê Kurdi xebitiye. Jix-we E. Xanî "Nûbara Biçûkan" di sala 1683 an de nicisibû ku ev pirtük ferhenga Kurdi û Erebî ye. Herwehî kî zanîn xebatên ferhengî gelek dijwar in. ji bo ku mirov rîzimana wî zimanî ji bizanibe.

E. Xanî ferheng amade kiriye û rîzîn "inaye nîzam û intîzamî" ji tên wê têgîhî ku E. Xanî li ser rast-nivîsîn û rîzimana Kurdi xebitiye.

Di warê rîzimana de tu xebatên wî hebûn an tunebûn? Mixabin em bi viya nizanîn; lê belê em dizanîn ku Xanî li ser rîzimana Kurdi xebitiye û loma dibêje "inaye nîzam û intîzamî".

Çavkanî:

15) E. Xanî, Mem û Zin, r:60

16) E. Xanî, bhd, r:60

Gur û rovî bûn heval
Bi dil û can, ruh û mal

Pirr bi hevdû şêrîn bûn
Herdu bi hev evîn bûn

Dane hevdû bext û soz
pê bûne xudan yek doz

Keftar cîranê wan bû
Bi hersê yek eywan bû

Dest û milan dane hev
Kar dikirin roj û şev

Roviyê pîs, hîlekar
Gur şandî bal keftar

Go xwestina me ev e
Tu ji eywanê derkeve

Keftar gote mamê gur
Kerem bike were vir

Heta rih bibe buhist
Tu car dijmin nabin
dost

Gurê serhişkê nezan
Dirêş bû çoyê eywan

Ewî û keftar şer kir
Serî li keftar perçê kir

Rovî ji piştve lêxist
Keftar ser dev erdê xist

Keftar çû mal nexwş
ket
ji kerban re felc lê ket

Wê gav pey wî dane
dar
Bû wek benek stûxwar

Malên xwe temam firot
Tev cilan heta bi bot

Jê rî mabû yek bexçe
Fiyet danî bîst akçe

Gurê da rovî pere
Go her ji mer bikirre

Keftar gelek pê zor hat
Rabû kir terka welat

Gur û rovî bûn ortax
Bexçe kirîn gul û bax

Gur xebitî bi rastî
Ruh û canê xwe westî

Roviyê bêbext û soz

xirabî ji xwer kir doz
Ev gur ne j' qewmê me
ye

Gazna wî j'me tuneye

Ya baş ji me re ev e
Ew ji nav me derkeve

Çavên wî tê nebirri
Tiştek jî neket serî

Go bi min tenê nabe
Divê hewar lê rabe

Go serê te mezin e
Tiştek te li vir tune

Gur go pirsa ez bêjim
ji can û dil dibêjim

Qesem navê xwedê kim
Ezê guhê te jêkim

Pirrî li zora gur çû
G o ez nehatim recû

Rovî go tu feqîr i

Qewmê go gur dardake
Rovî go icab nake

Belê heqê wî dar e
Çibkim ew xizmetkar e

Rovî emrê apo kir
Guhê gurê şîn jêkir

Gur sekinî ne qedand
Çû mal guhê xwe
kewand

Demek wisa derbaskir
Ta ku hestî xelaskir

Paşî zarokê wan bûn
Kuflet li wan giran bûn

Zarokê wan mezin
bûn
Tev mîr û kur û jin bûn

Gur zêde bûn bûne pirr
Hestî têra wan nekir

ji bo hestiyân şer
danîn
Rabûn qira hev anîn

Paşê rabûn bûne yek
Nivîsandin kaxezek

Kaxeza wan da ev bû
Tev bi zêr û zever bû

Hestî me re hindik e
Serî pê îhsan bike

Dane destê dergevan
Rabû çûye gote wan

Daxwaziya wan ji me
Ser û pê jî bidne me

Rovî li textê jor bû
Çav li nav serî sor bû

Îro dora serî ye
Sibê dora hemî ye

Qewmê min ji wan
pirrtir e
Hestî ji wan re pirr e

Înad bikin bazar e
Wê herin rîka keftar e

Cenda go gur nabin yek
J'xwer danayin
seriyek

Ji ber roviyê fenek
Rezîl dîbin yek bi yek

Gur û Rovî

Î. Omerî

Di Rojnameya Welat hejmara 8, rûpela 14 an de helbesta Gur û Rovî we gelek bi seqetî û kêmâyî nivîsandiye û wesandiye. Ev helbest li gora weznê hatiye pêkanîn, wezna wê 7 kît in. Şêwe, ziman, pênuş û carek din jî peyvîn ku di pey hevdû de di nava helbestê de bêrawestan diherikin. Em guman dîkin ku ya seydayê mezin mamosse Seydayê Cegerxwîn e.

*Em vê helbestê li gora zanebûna xwe rast dîkin û dîsa ji we re dişînin.
Eger hûn bi R. Brûsk re pêwendîya xwe karîbin bikin û hûn dîsa
biweşînin emê gelek kêfxwêş û bextewar bibin.
Li ser navê civatek ji Kıziltepe*

Rabû geriya heval
L'bav û kur, ap û xal

Em û hûn ê hevdû ne
Gurê ê şînê piştxwîn e

Eger lêbek bibîne
Wê me ji vir derxîne

Tedbîra xwe bibînin
Em wî ji vir derxînin

Dane hevdû soza xwe
Gurê derxin ji nav xwe

Rovî şandîye pey gur
Go bila bêt heta vir

Gur hat guhê xwe da
wan

Xweş nedît murûsê
wan

Silav da wan sekinî
Rovî rabû pê kenî

Rovî bûye şervan e
Lê gur dayî me nan e

Pirsek li vir yek ji vir
Heta xwe lê kire gur

Tu rîncber i ne mîr i

Gur go bexçe yê me ye
Ferqa me qet tuneye

Gerçî ez i bêkes im
lê qewmê te re bes im

Rovî go qet deyneke
Apo wê te qet bike

Gur go qewmê te hene
Nizam mîr in yan jin e

Rovî bang kir dergevan
Ap û xal hatin meydan

Rovî go qewmêm heye
Yê te kesek tuneye

Gur di cî de sekinî
Rovî rabû pê kenî

Gur zanî hal xirab e
Bi rovî re şer nabe

Rovî go gur "çawani"
Gur go mîr'êm tu zanî

Rovî go gur zalim e
jê'r terbiye lazim e

Gurê tenê ma li mal
Ne bav û kur, ap û xal

Gur kete bextê rovî
Rih berda bûye sofî

Rovî pezek jê xwestî
Goşt xwar da gur hestî

Gurê şîn xwar pegranî
Qîma xwe bi vê yekê
anî

Gur xebitî dest û zend
Heqê gur rovî stand

Gur rabû çû zewicî
Hestiyân kirin du cî

NESRİN AYDIN


JİR REXNEGİR

BAREŞ BATÊ

BENGÎN SIRNAQ

REŞO ZİLAN

HESEN MİZGİN



EM BIXWİNİN

Sebra Telebanî

Destpêk rûpel 1

Serokên Başûrê Kurdistanê elîmine derve, bê derve sebra wan nayê. Geh li Bexda, geh li Tehranê, geh jî li Şam û Enqere ne. Tim jî bi devê wan "bêçare ne, bê mecal in û mecbûrê têkiliyên bi hikûmetên dagîrker re ne." Berê bi demekê Mam Celal Telebanî em nizanin cara çendan hate Tirkiyê. Ewil bi helikoptera "Çekiç Güç" hate Amedê. Piş re derbasî Enqere bû. Celal Telebanî serokwezirê dewleta Tirk Silêman Demirel, Turgut Ozal û Hîkmet Çetin dîtin. Bi wan re rûnişt û pirsên "hilbijartînê, PKK û hêzên Amerîkî li navçê minaqaşe kirin."

Ji gotinê Telebanî derdikeve ku rewşa ekonomikî li Kurdistanê pîrr xerab e. Telebanî wiha dibêje: "Pere ji me re lazim in, rewşa me di aliye malî de pîrr xerab e. 5 milyar Dolarên İraqê di benqên dînyayê û Amerîka de hene. Di nav van peran de para me jî heye. Em dê ji Ewrûpa bixwazin, para me bîdin me."

Ji bo PKK jî gotinê Telebanî ev bûn: "PKK ne li Bakûrê İraqê ye. Serokê PKK jî ne li Bakûrê İraqê ye."

Celal Telebanî pişti serdana xwe ya Tirkiyê çû Ewrûpa.

Yekîti xwirt dibe

Destpêk rûpel 1

Cih û war li dewleta Tirk teng bûye, şas bûye û har bûye. Bi tu awayî rastiyê qebûl nake. Li hember gerilla xwe nagire, hêzên wê belav dibin, ji aliye din ve têkoşina gerilla bilind dibe û têkiliyên gerilla bi gel re roj bi roj xwirtir dibe. Ji ber vê yekê dewlet ji tîrsa xwe har bûye, da ku rê li pêsiya têkoşînê bigire, çavê gel bîtîrsine bi metodên gemarî û bi hovitî erîsi ser gelê Kurd dike; reşenbîr û rojnamevanen Kurdistan ji paş ve dikuje, dixwaze bi tîrsandinê, gel ji têkoşînê dûr bixe, rojnamevan û welatparêz dengê xwe dernekin, da ku dewlet bi hêsanî gel qir bike û yekîtiya gel û Partiya Karkeren Kurdistan xera bike. Lî dewlet pîrr dereng maye, gele Kurd û gerilla bûne wek goşt û hestî, ji hev hilnabin, bi hev ve ne. Heta roja azadî û serxwebûnê gelê Kurd û gerillayen Partiya Karkeren Kurdistan wê bi hev re bin, yê ku çavên wan ne kor in vê bas dibînin.

Rojnamevanê Ozturk Gundem Hafiz Akdemir 8'ê Hezîranê ji tîref Kontr-Gerilla ve hate kuştin, dora rojê cenazê Hafiz ji aliye polisan ve hate revandin û defin kîrin. Rêvebirên Rojnamevanê Ozturk Gundem'ê ku ji bo merasima cenazê Hafiz çûbûn Diyarbekirê, dewletê protesto kîrin û gotin:

"HAFIZ AKDEMİR Kİ YE?

Hafiz di navbera salên 1984-1991'an de li zîndana Diyarbekir raza. Pişti ku ji hundir derket li Di-

xwe ye." Malbat û mirovên Hafiz Akdemir di derheqê Waliye Herêmê de dawe vekirin û ji bo ku cenazê Hafiz li Licê careke din bê veşartin, muracaatê Belediya Diyarbekir kîrin. Li Diyarbekir, Edînê û İstenbolê, kuştin û revandina cenazê Hafiz bi meş hate protesto kîrin.

Xwarziyê Hafiz, Fuat Bulut di derbarê awayê kuştina Hafiz de ev tîst gotin: "Serê sibê saet li 8 an em bi hev re ji mal derketin da ku em herin ser kar. Hêja em ji mal 50 metre dûr nebûbûn, bi dengê teqîniyekî ez li xwe zivirîm, min dîk ku xalê min Hafiz li erdê dirêj bûye û xortek jî sîlah di dest de direve, min da ser ku wî bigirim, li min zivirî berekek berda min jî, berekâ wî ez ne girtim. Dûre xwe ji ber çavên min winda kir. Ez vegeiyam û me xalê min rakir nexwesxanê."

Ji xeynî Fuat hejmarek kesen din jî dîtin bi ci awayî bûyer çêbû. Li gor gotinê wan, kesê ku ji paş ve erîse Hafiz kîrin, qasê 20-22 salî, esmer, ne dirêj ne jî kin, ji pêş ve porê wî hinek weşiyât û şal û şapîkî qot lê bû.

Hafiz Akdemir û xebatkaren Rojnamevanê Ozturk Gundem ên ofîsa Diyarbekir giş, ji mehek du mehî ve bi telefonan dihatin tehdît kîrin. Di telefonê de wiha digotin: "Dora we jî hat, hûnê jî bîmirin."

HAFIZ AKDEMİR Kİ YE?

Hafiz di navbera salên 1984-1991'an de li zîndana Diyarbekir raza. Pişti ku ji hundir derket li Di-

yarbekir dest bi nûçevaniya Rojnameva Yeni Ulke kîrin. Hafiz nêzîkî salekê di Yeni Ulke de xebîfî û derbasî Rojnameva Ozgur Gundem bû. Hafiz, edîz zehfî derbarê heyetîn biyanî yê Kurdistan ziaret dikirin û li ser Kontr-Gerilla nûçê çedîkirin. Hafiz berî ku bê kuştin li ser bûyeren Newrozê reżnivisareke dirêj amade dikir.

PROTESTOYÊ ROJNAMEVANÊ DİYARBEKIR

Roja ku Hafiz hate kuştin, saet 5'ê evarê rojnamevanen Diyarbekir li komela Rojnamevanen Rojhilata Başûr (Güneydoğu Gazeteciler Cemiyeti) li hev civiyan, biryar girtin ku dora rojê nûçeyan neşeyin navendên rojnamevanen xwe û tev bi hev re heta avahiya Waliye Herêmê (Bölge Valisi) meşîyan. Dora rojê ji xeynî nûçeyen di derheqê Hafiz de tu nûç jî navendan re ne şandin û fax û teleksen xwe şptal kîrin û nêzîkî 60 rojnamevan bi pankarta "Şehîdîn çapemiyî nemir in" heta avahiya Walf meşîyan. Rojnamevan ji Walf Unal Erkan daxwaza lidarxistina mitîngékî kîrin. Walf daxwaza wan qebûl nekir û got: "Em destûr nadin çekirina mitîngê."

Pâşî rojnamevan giş bi hev re ji bo serdanê, mala Hafiz ziyyaret kîrin.

Jİ CENAZE DİTİRŞİN

Dîsa eynî ew roj, 9 Hezîran roja şêşemî, pişî nîvîro saet li 3'an konmek polîs erîsi ser morga Nexwesxana Fakulteaya Dicle kîrin û bi darâz zorê cenazê Hafiz revandin. Polîs berî ku cenazê birevînin, ji

bo destûr resmî dixwazin kaxezekî bi biraziyê Hafiz, İbrahim Bulut bidin imze kîrin. İbrahim imze na-ke, li ser vê yekê polîs rismî wî û hevalê wî Murat Maltaş dikişinîn, dûre ji telefonê diya Hafiz dîkin, dibêjîn: "Emê Hafiz bitemîrin we-re ser tirba wî." Diya Hafiz teklîfa wan red dike, dibêje: "Merasîma cenazê kurê min wê sibê çêbe, ez nayêm."

MESA ROJNAMEVANAN LI İSTENBOLÊ

Li İstenbolê nêzîkî 200 rojnamevan li Komela Rojnamevanen Hemdem (Çağdaş Gazeteciler Cemiyeti) li hev kom bûn û bi mebesta protestokirina kuştina Hafiz, tevî astengiyen ku polîs derxistin heta Walîtiya İstenbolê meşîyan

Li Edînê ji hejmarek rojnamevan qetîkirina Hafiz protesto kîrin. Li ser vê yekê 10 rojnamevan xistin bin cav.

DEWLET PROTESTO KİRİN

Rêvebirên Ozturk Gundem, Ra-

gip Duran, Yaşar Kaya, Ramazan Ulek, Semra Somersan û Raîf

Turk roja çarşemî bi Unal Erkan re peyivîn û ev kîrinê dewlet protesto kîrin.

HAFIZ WÊ LÎ LÎCÊ BÊ DEFİN KİRİN

Malbat û naskiriyen Hafiz ji bo ku Hafiz li Licê ji nuh ve bi mera-

sûm û bi meş bê defin kîrin mura-

caatê meqâmî resmî kîrin.

Di rojê pêş de gerek e Hafiz li gundê Licê, Sîsî bi meşke gurr û

geş bête defin kîrin.

ROJEVA WELET

Wezîfa Hafiz û ya dewletê

Destpêk rûpel 1

Armancê Hafiz hebû û ji bo bigîhîye vê armancê wezîfa xwe pêk tanî. Dewleta Tirk jî xwedî armanc e û wezîfa xwe pêk tîne.

Her mirov, her tîst û her sazî li pey armancekê ne û xwedî wezîfeyek in. Wezîfa li gor armancê şekîl distînîn û diuguherin. Şeweyê pêkanîna wezîfa yan jî, li gor pêvajî, dem û rews û tekeleyen xwedî wezîfe diuguher.

Wezîfa rojnamevanekî, gerîna li pey rastiyê ye (her çiqas wezîfeyea rojnamevanen Tirk veşartina rastiyê be jî). Wezîfeyea dirokzanevê, bi awayekî ilmî û objektif lêkofin û nirxandina paşeroyê û ronahîkirina pêşeroyê ye. Armanca gerilla, hilweşandina sistema kevin a paşeroyê û afirandina dirokeke nuh e, wezîfa wî jî li gor vê armancê şekîl distîne. Ji bo gîhiştina armanca xwe, wezîfa wî ew e ku di warê şoreşvaniyê de xwe bi pêş xe û li ser bingehê hezkirinê bi gel re têkîl û girêdanên xwirt çekirin e.

Tîstekî bê armanc û wezîfe tune. Dewlet jî li dû armancekê ye û xwedî wezîfe ye. Dewleteke adîl û demokrat li pey edalet, demokrasî û pêşvebirina mirovahîye ye. Wezîfa wî jî pêkanîna kîrin ên çê, pêwendiyen pêşverû û dorfîrekirina bajarvaniyê ye. Bi kurî parastina taybetî û rûçikên pêşvebirinê, wezîfa dewleteke pêşverû ye. Helbet dewleteke paşeroyê û fâşist jî ne bê wezîfe û armanc e. Armanca wê paraçuna sistema kevin û berjewendiyen çîna serdest û paşeroyê ye. Wezîfa wî jî girêdayê menfe- eten serdarên vê dewletê ye. Yanî wezîfa wî kedxwari, tîrsandina gel, zêdekirina saziyên fâşist û ji holê rakirina mirov û ramanen pêşverû ye.

Ji ber vê yekê lazim e ev kîrinê dewletê, yanî qetîkirina Hafiz, Cengiz û Xalidan me şas nehîle. Kuştina mirovên pêşverû, ji bo dewleten fâşist wezîfe ye. Ji bo parastina faşîzmî, Hitler ne tenê şoreşvanen çekdar di kuştin, bi hezaran mirovén reşenbîr jî ji zîlma Hitler para xwe distand.

Wezîfa dewleta Tirk jî ew e ku faşîzma xwe biparêze. Ji bo parastina vê faşîzmî jî ci destê wî tê dike. Gerî dikariba wê ji Hitler û Franco ji xerabtir bikira, lê edî nikare. Her tîst xwedî sînor e, ji bo faşîzmî jî sînoredî heye, ew ji xwe re sînor daneyne jî, yê sînor jê re çêkin hene. Rê li ber faşîzma Tirk jî hêdî hêdî tê girtin. Emrê diktatoriya dewleta Tirk, ji hemû faşîzmîn din zêdetir domkir, lê emrê wê ji hindik maye. Bi pêşketin û bîlîndbûna têkoşina gelê Kurd re dewlet edî nikare wezîfîn xwe pêk bîne. Iro edî ev tîrsâ çavê gel şikestiye. Gelê Kurd bi xwîna xwe ev tîrs şikandîye.

Bi şehîdbûna şoreşvan û welatparêzekî re, bi sedhezaran mirov dibin yek û bi yek dengêkî diqîrin. Rijandina her dilopek xwîna gerilla û welatparêzan ji bo gelê Kurd û hemû mirovahîye dibe mîrasa berxwedan û serhildanê. Bi sayâ vê mîrasê tîrs dişkê, mîrasa heri mezin şikandina tîrsê ye.

Şikandina tîrsê bi xwe bawerî tîne, bi xwe bawerî kedî û têkoşînê bi pêşve dibe, pêşvebirina têkoşînê Hafiz, Cengiz, Xalid û Egîdan diafirine, xwîna her Hafizî jî bi hezaran Hafizan derdixe meydanê û gel dimeşe, bi vî awayî ber bi şoreşê ve.

Wezîfa faşîzmî çawa qetîkirina şoreşvan û reşenbîran be, ya me jî têkoşina şoreşê ye.

Tîp işareta deng e

Destpêk rûpel 2

Taybetiyekî zimanê kurdi jî ev e, ku ew zimanekî bi kîte ye. Xwendin û nîvisandin bi kîte-kîte dibe. Dema mirov tipa "i" ji alfabeysa kurdi derbixwe an jî kêm bi kar bîne, wê demê kîteyên gelek bêjeyan ji navê radibin. Sîsma ziman xirab dibe. Kîte di warê perwerde û hîndekariyê de roleke mezin û girîng dileye. Li her derê dînyayê, di destpêka xwendinê de, bi taybetî di pola (sinifa) yekem de mîmoste, metodê analîz û sentêzê bi kar tînin. Ew metod ji bo hînkiri na xwendin û nîvisandinê yê herî hêsan in. Ew zimanê ku bêjeyen wan bi gelek tîpîn bêdeng tîn nîvisandin ji man metodan re nabin. Mesela di dema analîza gotina "grametik" de, mirov nikare kîteya (heceya) yekem li gor tîpan perçe bîke. Ji ber ku "gr" du tîpîn bêdeng in û dengen wan bi hevdû re derdikevin. Gelo kîjan babe-eğit dikare bê "i" vê bêjeyê kîte bîke: "dgrm."

Niha li gelek welatên Ewrûpayê mîmoste û perwerdekar (egitimci) li ser vê yekê gotûbêj dikin. Ji bo hînsankîna alfabeysen xwe, dîtinê xwe dînîvisinîn. Seminer û civînen perwerdeyî çedîkin. Ji wan welatan yek ji Swêd bi xwe ye.

Kurdên Yekîtiya Sovyeta

Destpêk rûpel 1

Tevgera Rizgariya Neteweya Kurdistan ya ku Partiya Karkeren Kurdistan di bin Serokatiya qehremânîn gelemevi Abdullah Ocalan de dimeşine, hûn dihesibînîn wek hereketekî terorist û dixwazin di cihanê de îsbatkin ku hûn li dijî têrörê ser dikin. Di cihanê de kî ye terorist û kî ye ne terorist iro diyar û beli ye. Neteweyek ku di bin nîrê koloniyalîzmî de dihat zêrandin û welatê wî dihat wêrankirin û iro şiyar bûye û ji bo serxwebûn û azadîye daw û doz daniye, terorist nîne! Lî pêşengê wî daw û doza PKK ye. Iro be an sîbê be hûn mecbûr bîmînîn Partiya Karkeren Kurdistan nas bikin wek berpirsiyare hemû gelê Kurd...".

Mayinên li ser sînoran rakin

Mebûsê Şirmexê Mehmed Alinak doza rakirina mayinan dike. Gerek mayinên ser sînoran rabin. Berî bi çend rojan, ev daxwaza xwe da meclîsê. Di derheqê bombeyen bin erde de ev got: "Li herêmê roj bi roj hejmara mirovîn lingjîkirî zêde dibe."


Li aliye din Alinak rexneyen xwirt li hikûmetê girtin. Di nav van rexneyan de ev jî hebûn: "Hikûmet li aliye kî behsa mafîn sendîqayan dike û li aliye din jî nahêle karker herin grev." Her wiha Alinak got ku: "Ji rojava heta rojhîlat zilmeke mezin li ser xelkê heye. Gelo ev zîlm bi devê hikûmetê ye yan bi emrê MGK'ye ye, em bersîvî dixwazin."



**KÜRT MUTFAK KÜLTÜRÜ
VE KÜRT YEMEKLERİ**

Ala rengîn li bajarê Berlînê Li ser kela "Spandau" pêl dide

● Bi hevkariya "Mala Gelêri ya Kurdi" ya bajarê Bremenê, dibistana bilind a Bremen û Fermaya Huneri ya taxa Spandau li Berlînê, raxistiniek (Pêşangeh) li ser çanda rojane ya Kurdan pêk hat.



Nivîskarê Kurd Mistefa Reşîd ji Berlînê dinivîse

Bi hevkariya "Mala Gelêri ya Kurdi" ya Kurdi" ya bajarê Bremenê, dibistana bilind a Bremen û Fermaya Huneri ya taxa Spandau li Berlînê, raxistiniek (Pêşangeh) li ser çanda rojane ya Kurdan pêk hat. Hêni di komcivîna Belediya taxa Spandau de, roja 15.11.1989 an de bîyar hatibû standin ku ev raxistin di Keleha Spandau ya dîroki de çêbibe.

Yekîtiya Rewşenbirê Welatparêzen Kurdistan - YRWK, piştigiriya xwe ji vê raxistinê re da xwiyakirin. YRWK pêwendî li gel berpirsiyare raxistinê danî û di amadebûnê de bi çalakî cih girt.

Saxê YRWK yê Berlînê û Komelaya Botan kar û barê raxistinê dane ser milê xwe û berpirsiyara bernameya çandî heyâ davî-

ya raxistinê hilgirtin.

Berî vekirina raxistinê bi rojekê (22.5.1992), konferansa rojnamegerî pêk hat. Berpirsiyare Belediya Spandau (Sigurd Hauff) li pêşîya rojnamevanan li ser giřingiye vê bûyera çandî, li ser çanda gelê Kurd û doza wî ya siyasî neteweyî axift. Wî da xwiyakirin ku gelê Kurd divê mafê xwe yê çarenûstî bistîne, ew mezentîrîn gel e li cihanê ku hîn dewleta xwe ava nekiriye û ji lewre serxwebûna gelê Kurd mercekî bingehîn e da ku aştî li Rojhilata Navîn peyda bibe û pêşveçûna aborî û civakî pêk bê.

Di pişt re Prof. R. Mönch, serokê xwendegeha bilind a Bremen li ser çanda gelê Kurd, dîroka wî û tevgera rizgarî û serxwebûnê axift. Her wisa gote rojnamevanan ku, ji sala 1984 an ve li Bakûrê Kurdistanê şerî leşkerî bi awayê gerîllayî li dijî leşkerên Tirk dest pêkirîye. Ev navê "terorîzmî" ku davêjin ser vê tevgerê, ne tiştekî rast û dirûst e, wî li ser raxistinê informasyon da û got: "Ev tişten me li vir danîne pîrsa çanda rojane ya Kurdan bi temamî têrê nakin, lê dîsa jî me ji her şêweyekî jiyana wan hin tiş pêşkês kirine.

Li qatê jêrîn me nawelêن (alet) Kurdan ê şer, tişten muzikê, xemlîn jinan û mîran, zîn, zengû, heqîb, berdeh, rişmeyen hespan... û tişten din danîne. Li qatê jorîn awayê jiyana Kurdan bi sê-çar şêweyan hatîye rézkirin. Ji malên gundiyan, malên dewlemendan, konên koçeran, text û nivînan, nawelêن çandinê, yên jîyanê, cil, xêli, kilim, mefûr, çek... her tiş hatîye danîn.

Hevalekî bi navê Komelaya Botan û YRWK, spasdariya mîvanan û vê pêkanîna hêja kir û da xwiyakirin ku Kurdên li Berlînê dijîn, wê di van 3 mehan de di hundîrê kelê de pîr caran şevîn çandî û semîneran li ser çand, dîrok, wêje û tevgera rizgariyê pêk bînin.

Roja 23.5.1992 an, rojnamevan bi wêne û komentar li ser raxistinê doza gelê Kurd û tevgera rizgariyê bi fitêhî nivîsandin. Wek nimûne rojnameya "Berlin Morgenpost" ku mezintîrîn rojname li Berlînê ye, dinivîse: Ev raxistin, li hêlekê geşbûn û ciwanîya çanda Kurd dide xwiyakirin û li hêla din rewşa zordarî, awrebûyî, êş û jana vî gelê mezin ku heya niha bê dewleta maye, tîne pêş çavan. Ev raxistin ku di bin siwandiriya Senatorê Kulturî yê Berlînê de pêk tê ev ditîna me li ser vê pîrsê mîlak (îspat) dike.

Wê li gor peymana me li gel berpirsiyare Alman, rengê Kurdi (Kesk, Sor û Zer) li ser ke-

la Spandau hatin hildan û civîna Ferma bi temamî li saet 16.00 dest pêkir. Gelek mirovîn Alman û Kurd, parlamenter, endamên meclîsa bajêr... hatibûn.

Berpirsiyare belediya bajêr; li ser giřingiye raxistinê axaft û got: Li vê taxa bajêr bi taybetî hejmareke mezin ji Kurdan dijîn û ji bo vê yekê me xwest ku ev raxistin li vir pêk bê. Ev raxistin ji bo hevnaskirina gelan, ji bo jiyanek xwes û navbera Alman û Kurdan de li Berlînê geleki hêja ye. "Gelê Kurd xwediyê çand û hunera bi nirx e. Ev gel; divê mafê xwe yê sirfîstî bistîne û bibe serdarê welatê xwe."

Piştire doxtorekî Kurd, awirek li dîroka Kurdistanê ya sedsala 20 an xist û bi taybetî li ser peyman û biryarekongreyen navneteweyî rawestiya. Wî da xwiyakirin, çawa wan dewletê ku Kurdistan li hev parevekirine her carê gelê Kurd xapandine, biryarek navneteweyî bi cih nanîne û bi zor û lêdan û qirkirîne gelê me heyâ niha bindest hiştine.

Prof. R. Mönch li ser pêwestiya raxistinê, hem ji bo gelê Alman û hem ji bo gelê Kurd rawestiya. Da xwiyakirin ku, ji ber ev rewşa dijwar a ku gelê Kurd tê de dijî me nikaribû pirr tiştan ji çand û jiyana vî gelî bidin ber çavan. Ev dewlemendîya hunerî ku hîn dibînîn û hûnê hîn bibînîn tenê tiştekî biçuk e ji gencîneyeke mezin. Ew paşê hate ser rewşa iroyîn a gelê Kurd rawestiya û da xwiyakirin çawa ev gel li her çar perçeyen Kurdistanê tê perçiqandin û tunekirin. Li hember vê zordariya giran gelê Kurd ji neçariyê dest avetiye çekan û ji bo serxwebûn û azadiyê şer dike. Tevgera rizgariya neteweya Kurdistan bi pêşengîya Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistan (ERNK) edî li Bakûrê Kurdistanê gîhiştîye tangeke gelê bilind.

Profesorê bi rêz di dawîya axaftina xwe de spasdariya hemû kesen besdar kir û bi taybetî YRWK, BOTAN.

Careke din berpirsiyare belediya bajêr hate pêşîya mikrofonê û bi şêweyekî ramanî vekirina raxistinê pîroz kir. Piştî mîvan ji sérkirin û temashê vegeriyan edî di hewşa kelê de bernameya folklorî dest pêkiribû. Bi dîlana zaran, govendîn keçan û xortan û stiranên şoreşeri yê Koma Botan ev şahî hate xemilandin.

YRWK, BOTAN, YJWK û YXK wê gelek şâhiyan pêşkês bikin. Her wisa jî wê YRWK gellek semîneren zanyarî, wêjeyî û gellek axaftinan pêşkês bike.

Raxistin heya 30.08.1992 an berdewam dike.

